kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

HAVÎN/2010



46

www.kurmanci.org

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 46, havîn 2010
Ansvarig utgivare
Ali Çiftçi

Redaksiyon
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post
info@birnebun.com

Internet
www.birnebun.com

Têkilî/İlişki
Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83
Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294
Amerika: Mam Recall, mamoste.kart@yahoo.com

Belavkirin / Dağıtım
Ewrupa: Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:
Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32
KIZILAY / ANKARA
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı
Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone
Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn" PlusGirot-Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı
Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Ji kombûna kurdên Anatolîya Navîn li Kopenhagê, 29ê gulana 2010an

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivakurdi.org

NAVEROK / İÇİNDEKİLER





Wêneyê li berg: Du jinên ji Gundê Omê
Cavkanî: Ahmet Yilmaz (ji gundê Omê)

2 Ji Bîrnebûnê – *Ali Çiftçî*
4 Li Danîmarkayê
kurdên ji Anatolîya Navîn konferansek li dar xistin – *Yilmaz Yildiz*
9 Festivala gundê Celika – *Ayhan Kuş*
10 Şeva komela GÖLSAĞê! – *O. Xelikî*
13 Konferansın açılış konuşması – *Mahmut Erdem*
15 Kurdên deşta Anatoliyê – *Nuh Ateş*
26 Yekîtiya Ewropayê û Kurd – *Nebi Kesen*
28 Mîrasa çanda kurd – *Etnolog Haci Akman*
34 Perwerdeya bi zimanê dê – *Ali Çiftçî*
40 Yerel yönetimler – *Bilal Inekçi*
43 Etno-Dinsel Arındırma, Tektipleştirme, Türk-İslamlaştırma ... *Mehmet Bayrak*
54 Li Swêdê ji bo her sê meclisan helbijartina 19ê îlonê
55 Hediye Güzel
56 Seyfi Dogan
58 Serdar Köse
59 Feqiyê Teyra – *Mem Xelikan*
62 Baran barî – *Mem Xelikan*
66 Serxweşê evînê – *Xizan Şîlan*
69 Daxwazên min – *Seyfî Doğan*
70 Hakhata – *Seyfî Doğan*
73 Nar sor nebû – *Mam Recall*
82 Ji Mikaîla çend henekên bûyî – *Dr. Mîkaîlî*
87 Pênc qehreman – *Îrfan Baysal*





www.arsivakurdi.org

Ji destpêka biharê vir ve li Rojhilata Navîn û bi taybetî jî li welêt rojane em bi bûyerên pir rengîn ve rûbirû bûn. Çi xweş û çi nexweş rojeveka întesîv û dagirtî...

Ji bûyerên li her aliyê welêt û bi vê re girêdayî li welatên Ewropa û metropolan dîsan însanên me li ser piya bûn. Protestoyên li dij rejîma hovane ya îslamî li Îranê ku di 9ê meha gulanê de çar siyasetmedar û çalakvanên medenî, bi dar ve kirin. Kurdan bi çalakiyên protestoyî û bi daxuyaniyan hem xwestin şerê ku îro li ser axa me tê meşandin û herwiha hovîtiya Îranê li hember gelê kurd di rojevê de bihêlin, mixabin ji ber rewşa krîza aborî ya cîhanê û berjewendiyên dewletan hemû dinya dîsan li hember vê hovîtiya rejima Îranê bêdeng ma!..

Ji aliyekê ve jî dema aramî çêdibe em dibînin ku li welêt ji aliyê xebatên medenî yên çandî û edebî ve gavên hêja têne avêtin. Li bajarên kurdan yên wek Amedê, Mêrdînê, Colemêrgê, Wanê, Batmanê li ser edebiyat û zimanê kurdî kombûn û konferans têne çekirin û zimanê kurdî aktualîze dibe.

Îsal, di destpêka gulanê de li bajarê Amedê pêşengeha kitêban bi awayek berfireh çêbû. Ez bi xwe jî bejdarî pêşengehê bûm. Her çiqas aliyên wê yên ku divê bên rexnekirin û kêmasî hebûn jî bi tevayî dema em bala xwe bidinê, pêşengeha kitêban serkeftî bû. Beşdariyek girseyî û alaqayek baş bû. Bi taybetî ji weşanxaneyên kurdî û kitêbên kurdî re alaqayek pir hebû. Piraniya weşangeran bawer nedikirin ku dê beşdariyeka wiha mezin bibe. Hemû weşanger bi rûken û bi hêvî bûn!

Yek ji kêmasiyên girîng a pêşengeha kitêban ev bû: li bajarekî wek Amedê ku hemû rûniştvanên wê kurd in zimanê ku ji aliyê organizatorên pêşengehê ve dihat bikaranîn tenê bi tirkî bû. Herwiha kataloga pêşengehê jî her dîsan tenê bi tirkî bû. Katalog normal berê pêşengehê tên belav kirin, lê li vê pêşenghê heta roja destpêkê jî katalog nehatin belavkirin. Bi hêviya ku sala bê hem belediya Amedê ku ji bo peşengehê destekeka pir dabû, di vê meselê de bê daxwaz nebe! Pêşengehên(fuarên) kitêban normal dibe warhega fikrên azad. Divê hem xwediyê pêşengehê, TUYAB û hem jî hevkarên wê li ser ti ziman û dîtînan qedexeyan daneynîn.

Di fuarê de semînar û gotarên pirrengî yên edebî, civakî û sîyasî jî hebûn. Piraniya semînerdarên kurd li ser wêjeya kurdî bi kurdî deng kirin. Ew jî ciyê pesinandinê ye ku hêviyekê dide bo pêşerojê.

Li Danîmarkayê konferansek li ser kurdên Anatoliya navîn di 29 gulanê de pêk hat. Konferans ji aliyê komîta amedekar a pênc kesî û herwiha bi hevkariya kovara me, Bîrnebûn û bi sponsoriya *Waqifa Kurdên Anatoliya Navîn li Stockholmê*, li Danmark; Restorang *Sultan*, *Danka, DEKAF*, Salona daweta *Leyla*, partiya *SF*, *Torve Cafe*(Osman Ciftci), Mobilyaci Mesut Yuksel ve hat piştwazêkirin.

Li vir divê em sipasiya van hevalên jêr bikin ku ji bo vê yekê xwe dan ber komîteya

www.arsivakurdi.org

amadekariya vê xebatê: Birêz Mahmut Erdem, Îrfan Baysal, Osman Çifçi, Bilal Înekçi, Enver Kesen û Halil Kara.

Konferans bi beşdariyeka xort û bi baldarî hat guhdarîkirin. Xebera vê konferansê ji pênûsa birêz Yilmaz Yildiz ku ji kovara Dema Nû ye ve hatiye amedekirin.

Hemû gotar di vê hejmarê de wek dokumetasyon hatine weşandin: Bi sernivisa *Kurdên deşta Anatoliyê -Koçberiyeke bêrawestî-* ji aliyê Nuh Atêş, *Pewerdeya bi zimanê dê*, Ali Çiftçî, *Yekitiya Ewropayê û kurd,* Nebî Kesen, *Mîrasa çanda kurd,* etnolog Prof. Haci Akman. *Etno-Dinsel Arındırma, Tektipleştirme, Türk-İslamlaştırma İhaneti ve Dersim*, Mehmet Bayrak, *Yerel Yönetimler,* Bilal İnekçi.

19ê îlonê li Swêdê hilbijartinên her sê meclîsan dibe. Em pê dizanin ku însanên me di hilbijartinan de ne aktiv in. Me xwest bi çend kesên ku bi sala ne di nav partiyên siyasî yên Swêdê de kar kirine li ser hilbijartina ditîn û tercubên wan bi xwendevanên xwe re parve bikin.

Yek ji hîmên demokrasî û azadiyê di civakekê de ev e; her însanek mafê xwe yê dengdayînê li gor bîr û baeweriya xwe bide. Ew maf û berpirsiyariyeka însanî ye.

Me bi birêz Seyfî Doğan re reportajek kurt çêkir ku bi xwe yek ji endamê redaksiyona kovara me ye û bi salan di civaka Swêdê da hem tercubeyên xwe yên kar û hem ji yên sîyasî çêbûne.

Serkan Kosê ji zaroktiya xwe de hatiye Swêdê, li vir mezin bûye û her xwendina xwe li vir kiriye, Me xwest bizanin ka ew ji bo çi û bi çi armancê ketiye nav xebata siyasî.

Hediye Güzel, ji neslê duduyan ya ji kurdên Anatoliya Navîn e ku ji ciwaniya xwe de di nav rêzen partiya xwe de cîh girtiye û herwiha bi salan wek berdevka partiya xwe kar kiriye. Me dîtinên wê jî li ser karên sîyasî û hilbijartinan pirsî û pê re sohbet kir.

Birêz Mem Xelikan di quncîka edebiyatê de li ser *Feqiyê Teyra* û helbestên wî şiroveyek kiriye û girîngiya hunera helbestên Feqiyê Teyra tîne rojevê. Ew Feqiyê Teyra dike yek ji sê stunên wêjeya kurdî. Bi sernivîsa *Baran Barî* dîsan Mem Xelikan bi kurteçîrokek edebî ev hejmara xemilandiye.

Birêz Xizan Şîlan di quncîkê helbestan de bi helbesta xwe ya *Serxweşê Evînê* rengekî edebî daye vê hejmarê.

Seyfî Doğan bi helbestek û prosayeke bi navê *Hakhata* wek stileka serbest a taybetî û felsefîk rûpelên vê hejmarê jî sêwî nehiştiye.

Birêz Mam Recall jî bi sernivîsa *Nar sor nebû* di beşa vegotinê de bi vê nivîsa xwe ya yekem kovara me di aliyê wêjeyê de dewlementir dike.

Ji henek û zargotinên Anatoliyê birêz Dr Mikaîlî bi sernivisa *Ji Mikaîla çend henekên bûyî ji vegotina Mehmedê Hecêbeg* û Îrfan Baysal bi sernivîsa *Pênc qehreman* tevlî vê hejmarê bûne.

Heta hejmara payîzê, bi hêviya havîneka xweş bimînin di xêr û xweşiyê de!

Alî Çiftçî

www.arsivakurdi.org

Li Danîmarkayê kurdên ji Anatolîya Navîn konferansek li dar xistin

Di roja 29.05.2010'an de kurdên ji Anatolîya Navîn li Danîmarqayê li bajarê Işøj, ku nêzîkî bajarê Kopenhagê ye, konferansek di bin navê *"Konferansa Kurdên Anatolîya Navîn"* de pêk anîn.

Konferans ji alîyê Komîta Amedekar û bi hevkarîya kovara *Bîrnebûn*ê hate li dar xistin û di seat 14.00 de dest pê kir û heta 18.30 berdewam kir.

Konferans ji serî heta dawîyê di nav atmosfereke baş de derbas bû û ji 350 kesî zêdetir beşdarî kirin. Taybetmendîyeke konferansê a delal jî ew bû, ku bireveberê konferansê Muzaffer Özgür konferans bi zimanê kurdî birêve dibir. Eva jî tiştekî gelekî baş bû û nîşana himbêzkirin û lêxwedîderketina zimanê kurdî bû. Hin ji axaftvanan axaftinên xwe bi kurdî û hinan jî bi tirkî kirin. Lê ew kesên ku axaftina xwe bi tirkî kirin jî di destpêkê de bi kurdî silav dan û bi xêrhatina mêvanan kirin

Konferansê bi yek deqe rêzgirtin ji bo şehîdên Kurdistanê, bi xwendina sirûda netewî *"Ey Reqîb"* û bi axaftina Mahmut Erdem, cîgirê serokê şaredarîya bajarê Brøndbyê li ser navê komîta amedekar û kovara Bîrnebûnê dest pê kir.

Mahmut Erdem di destpêkê de bi xêrhatina mêvanan kir û ji bo beşdarîya wan spasîyên xwe anîn ziman. Erdem, di axaftina xwe de gelek xalên girîng anîn ziman, xasima jî girîngîya welatê Danîmarkayê di sîyaseta navnetewî de û afirandina *"**Krîterên Kopenhagê**"* li vî welatî, ku zêde gelê kurd jî aleqedar dike û anî ziman ku bê çiqasî dewleta Tirkiyê lingê xwe dide tahtê ku van şert û mercan pêk neyîne. Erdem, di berdewamîya axaftina xwe de rewşa koçberîyê bi gişti li ber çav girt û got ku di hemi demên dîrokê de mirov koçber bûne an jî bi darê zorê hatine koçberkirin û axlebe jî gelê kurd para xwe ji vê koçberîyê wergirtîye.

Erdem weha berdewam kir: "Çî cihê ku kurdan xwe lê girtîye jî her dîsan bi gelek astengîyên nû re rû bi rû mane. Heta ku ji wan hatîye jî hewl dane xwe ku çand û zimanê xwe biparêzên. Car carna derûdorê bandora xwe li ser wan kirîye, lê li gel hewqas polîtîkayên asîmîlesyonê û li gel hewqas astengîyên ku derketine pêş jî, kurdên Anatolîya Navîn dîsan jî xwe din bin wan şert û mercên dijwar de li ser lingan hiştine û

www.arsivakurdi.org



Axêferên konferansê ji milê çepê: Nuh Ateş, Mahmut Erdem, Bilal Înekçi, Muzaffer Özgür, Nebî Kesen, Haci Akman, Alî Çîftçî, Mehmet Bayrak.

heta roja îro jî çand û zimanê xwe parastine. Çi kurdên Anatolîya Navîn û çi jî kurd bi giştî heta roja îro gelek bedêlên giran dane. Ji bo ku hebûna xwe biparêzin serî hildane, şer kirine û tekoşînên mezin dane. Îro kurd di demeke nazik de deras dibin. Kurd miletê herî mezin e li dinyayê ku bê dewlet e. Mafê gelê kurd e jî ku wek hemi gelên li dinyayê jîyaneke bi rûmet bimeşînin. Em ê wan rojan bibînin, ew roj nêzîk in".

Ji bilî sîyasetvan Mahmut Erdem, kesên ku ji bo konferansê hatibûn vexwendin ev bûn:

Nuh Ateş: Lêkolîner û nivîskar Nuh Ateş di axaftina xwe de li ser dîroka Kurdên Anatolîya Navîn û sedemên hatina wan ji bo Anatolîya Navîn rawestiya. Bi kurdîyeke xweş û delal pêvajo anî ziman.

Mehmet Bayrak: Lêkolîner û nivîskar Mehmet Bayrak bi kurdî mêvan silav kirin û bi tirkî axaftina xwe kir. Bayrak axaftina xwe di derbarê çand, edabîyat û folklora kurdên Anatolîya Navîn de kir. Di destpêkê de li ser derxistina kovara Bîrnebûnê, astengîyên wê û pêwistîya wê rawestiya û bal kişand ser sîyaseta li dijderketina çand û zimanê kurdî û weha berdewam kir: "Heke ku yek bixwaze miletekî têk bibe, yek pêşî bi çand û ziman dest pê dike". Bayrak girîngîya kovara Bîrnebûnê ji bo kurdên Anatolîya Navîn û herweha ji bo hemî kurdan anî ziman û daxwaz kir ku li vê kovara xwe xwedî derkevin.

Bi vê ve girêdayî jî bahsa dîroka dewleta Osmanî û berdewamîya wê a dewleta Tirkiyê kir û gelek nimûneyên nijadperest ji siyaseta tirkan a li himberî gelê kurd û gelên din raxist ber çavan, wek mînak axaftinên nijadperest ên heval û destê rastê yê Mustafa Kemal

www.arsivakurdi.org

Atatürk, wezîrê edaletê, Mahmut Esat Bozkurt di sala 1930an de. Bayrak da nîşandan ku dewleta Tirkiyê him kurd û him jî Ermenî, Suryanî û kurdên Êzîdî (gayrîmüslim) di qetlîaman re derbas kirin û li Dersimê jî qetlîameke mezin anîn serê kurdên elewî.

Li gor Bayrak dewletê di sala 1940an de li himberî gayrimüsliman yasayên taybet derxistin û van yasayan heta salên 1950an jî berdewam kir û xwestin van gruban bi van yasayan çavtirsandî bikin.

Dr. Nebî Kesen: Ekonomîst Dr. Nebi Kesen axaftina xwe bi kurdî kir û di destpêka axaftina xwe jî de weke rexneyekê li partîyên kurdan kir ku heta niha baş li ser kurdên Anatolîya Navîn nerawestiyane û ji ber vê yekê jî bê konsept mane. Herweha anî ziman ku divê kurdên Anatolîya Navîn jî xwe weke beşekî ji netewa kurd bibînin û divê partîyên kurdan jî zêde bala xwe bidin ser van kurdan.

Piştre jî li ser Yekîtîya Ewropa, Tirkiyê û pirsa kurdî rawestiya û anî ziman ku heta niha jî Tirkiyê ew şertên ku Yekîtîya Ewropa danîne ber neanîne cih û li hêla din jî Yekîtîya Ewropayê jî heta niha kurdan wek muxatap qebul nake, lê dîsan jî anî ziman ku divê yek qebul bikê ku pêvajoya muzakereyên di navbera Tirkiyê û Yekîtîya Ewropayê de hin guhertin bi xwe re anîne.

Dr. Nebi Kesen bi bîr xist ku pirsgirêka kurd pirseka siyasî ye û divê ev pirs di navbera Tirkiyê û kurdan de bê çareserkirin û got divê Yekîtîya Ewropayê jî ji bo pêvajoyeke bi vî rengî bibê alîkar. Herweha pêşnîyar jî kir ku divê sîyasetmedarên kurd hewl bidin ku tesîrekê li ser helwesta Yekîtîya Ewropayê bikin û daxwaz ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî kir ku ew jî ji aliyê xwe ve daxwazên kurdan bînin ziman û daxwaz ji Yekîtîya Ewropa bikin ku roleke erênî bilîzin.

Prof. Haci Akman: Etnolog û Prof. Haci Akman ji zanîngeha Bergen/Norweçê axaftina xwe bi kurdî li ser dîroka çand û kultura kurdên Anatolîya Navîn kir. Prof. Haci Akman kar û xebatên kovara Bîrnebûnê gelekî bilind nirxand û bi van gotinan anî ziman: "Yek dikare xebata kovara Bîrnebûnê bi kovarên kurdan ên di sedsala 20an de muqayese bike" û daxwaz kir ku kurd li vê kovarê xwedî derkevin.

Ji ber rola dayîkan di çand, ziman û kultura kurdî de li Anatolîya Navîn jî spasîyên xwe pêşkêşî wan kir. Prof. Akman piştî vê yekê qala muzexana Londonê kir, ku wî demakê çar mehan lê xebat kirîye û got ku wî li wir dîtîye ku bê çawa çand û kultura kurdan ji wan hatîye dizîn û talankirin û ji dagir-

www.arsivakurdi.org



Dîmenek ji konferansa kurdên Anatolîya navîn.

keran re bûye mal. Herweha bi alîkarîya dîmenan da nîşandan ku ew li wir rastî orîjînala şerefnameyê û sembola tawisa Êzîdîyan (sembola Tawisî Melek) hatîye ku li cem civaka êzîdî gelekî bi qîmet e.

Di berdewamîya axaftina xwe de anî ziman ku di ilm de divê her rastî bê gotin, lê got ku ew beşdarî çendîn konferansên navnetewî bûye û li wir ecem, ereb û tirk jî dîtine, lê wan carekê jî rastî li ser kurdan neanîne ziman. Prof. Akman got produksîyona çand û kulturê gelekî pêwist e û da zanîn ku divê kurd li xwe bigerin, li haviza xwe xwedî derkevin û li ser xwe binivîsin. Wek mînak cihûyên li Îngîltereyê dan nîşandan. Got ev 1000 sal e ku li wir dijîn, lê heta vê gavê jî nehatine asîmîlekirin. Çima, ji ber ku wan haviza xwe parastîye, li xwe geriyane û li ser xwe nivîsandine. Got mûzexanên wan hene, ji xeynî vêya pirtûkxaneyên wan. Prof. Akman bi bîr xist, ku muzexanên Ewropayê ku zêde di derbarê kurdan de tişt lê hene ev in: London, Paris, Moskow, Berlin û Norweç (Stavanger).

Ali Çiftçi: Weşanger û berpirsyarê kovara Bîrnebûnê, Ali Çiftçi wek her dem axaftina xwe bi kurdî kir û axaftina wî jî hemû li ser astengî, zordarî û asîmîlasyona li ser zimanê kurdî bû. Wî jî



Dîmenek ji konferansa kurdên Anatolîya navîn.

pêşî bahsa kar û xebata kovara Bîrnebûnê kir, li ser girîngîya wê sekinî û daxwaz kir ku kurd lê xwedî derkevin, bixwînin, bidin xwendin û tê de binivîsînin. Piştre jî bi berfirehî sîyaseta dagirkeran a li dijî zimanê kurdî bi bîr xist û got ku wextê ku dijmin bixwaze miletekî têk bibe, berîya her tiştî dest davêjin zimanê wî miletî û heta ku ji wan tê dixwazin di her warê jîyanê de têkevin nava wî miletî ta ku wan asîmîle bikin.

Got tiştê ku hatîye û tê serê kurdan jî her ev e û da nîşandan ku heta li Ewropayê bi xwe jî ketina nava kurdan û hewl didin ku wan asîmîle bikin, û got ku mixabin gelek kurdên me jî îro bi zarokên xwe re bi tirkî diaxivin. Eva jî malkambaxî ye.

Alî Çiftçî di derbarê perwerdeya zimanê kurdî li Swêdê agahdarî dan, gelek nîmûne ji welatên Ewropayê dan bê çawa kesên di rewşa kurdan de perwerdeya bi zimanê xwe dibînin û da zanîn ku heta ku kurd bi kêrhatî bin, ev derfet ji bo wan jî hene.

Bilal Inekçi: Cîgirê serokê şaredarîya bajarê Işøjê Bilal Inekçi jî di destpêkê de mêvan bi kurdî silav kirin û axaftina xwe bi tirkî berdewam kir. Axaftina Bilal Inekçi bi giştî li ser kar û xebatên şaredarîyê bû.

Piştî axaftinan û navbereke kurt, mêvanan pirsên xwe kirin û axaftvanan jî ew bersivandin. Piştre jî ji bo beşdarvanan xwarin û vexwarin hate dayîn. Êvarê jî li gel muzik û awazên kurdî sohbet berdewam bû.

Yilmaz Yildiz

Dema Nû/Kopenhag
01.06.2010

roniwelat@yahoo.dk

(Ev nivîs ji malpera Dema nû hatiye wergirtin. **Bîrnebûn**)

www.arsivakurdi.org

Festîvala gundê Celika

Ayhan Kuş

Şeşemin Festivala gundê Celîka (Kirkpinar) 18ê nîsanê li bajarê Kolnê pêk hat.

Di şênahiyê de Hozan Kawa, Sîpan Xelat, Newzat Tunç, Doğan Bîçen, Grup Hasret û Günay Tunç wekî stranbêj cîh girtin.

Di festîvalê de bi navê Komela hevgirtin û alikariya Kirkpinarê Ahmet Yaşar, rapora xebatê ya sala derbasbûyî xwend. Herwekî bi navê komîta nû Yaşar Güçlü ji xeberdanek kir. Güçlü di xeberdana xwe de bi kurtî li ser armancên festîvalên ku ew her sal dikin sekinî û got: "Armanca vê Festîvalê ew e ku gundiyê me yên ku li seranserê Ewropayê belawbûyî di saya vê de, salê carekê be jî werin cem hev, da ku têkiliyên wan xurtir bibin û malbat hevdu baştir nas bikin. Zarokên wan bibin heval û kultura xwe baştir binasin".

Di Fesîvala ku nêzikî 300 kes tevlêbûyî de zarokan bi kincên kurdî govend girtin.









www.arsivakurdi.org

Şeva hevdîtina *Gölsağ*ê hat çêkirin

O. Xelikî

Li bajarê Konyayê di roja 24.04.2010an da şeva hevdîtina Gölsağe çebû. Di şevê de gundîyên Xelika-Gölyazı û Sağlıkê bi heval, dost û mevanên xwe ve beşdarî şevê bûn. Bername ji aliyê Osman Sarıtaş ve hat pêşkêşkirin.

Birêz Sarıtaş di navberan da bi mesajên hêja mevan şîyar kirin. Got: 'Xelikî li derûdora xwe li xûdan derketina kultura xwe, nasnameya xwe ya kurdî û zimanê xwe te naskirin. Lê pirsgirekên me jî hene, êdî bes e, ma em ê hetanî çi wextê bi zimanê xelkê dengkinî, ma ne bes e.' Di şevê de bi navê Gölsağê serok birêz Hüseyin Kerpiç deng kir. Birêz Kerpiç, di dengkirina xwe de anîn ziman.

Di şevâ Gölsağê de çend mevanên ku em eşkere bikin jî hatin dîtin, endame civata şaredarîya Xelikan-birêz Cavit Havutçu, ji BDP (Partîya Aşitî û Demokrasîyê) birêz Mehmet Bozdağ, ji partîya Hak-Parê (Partîya Maf û Azadîyê) birêz Fehmi Demir û herweha helbestvan birêz Ömer Faruk Hatipoğlu, serokên şarederîya Xelikan yên berê.



Fehmi Demir di şeva Gölsağê de.



Afîşa şeva Gölsağê

www.arsiv.info.org



Grûba muzîkê û dengbêjên di şeva Gölsağê de, hozanê Xelikan Ahmet.



Mêvanên şeva Gölsağê

www.arsivakurdi.org



Hüseyin Kerpiç di şeva Gölsağê de.



Şaîr Ömer Faruk di şeva Gölsağê de.



Dawetnameya şeva Gölsağê.

Mesajên ku ji bo şevê hatin şandin, wek ya kovara Bîrnebûnê jî hatin xwandinê. Di şevê da ji bo kesên ku alikarîya Gölsagê kirine plakat hatin dayîn.

Di bernameya kulturî de hozan Ahmet, bilûrvan Gürbüz Gülkaymak û Kemalê Amedê derketin ser dîke.

Şev bi awayekî serkeftî xelas bû.

Ji bo şeva komela GÖLSAĞê!

Mêvanên bi rûmet û endamên komîta şevê, me ji dil û can dixwest ku em jî aniha bi we re bûna!

Malesef îmkanên me çênebûn û me nikarîbû em werin! Lê her çiqas em bi xwe di nav we de nebin jî, dilê me bi we re ye! Em hêvî dikin şeva we bi kêfweşî derbas bibe! Ev karê ku hûn dikin û pê radibim, karên pir muhîm in. Di rojên pêş de ji bo parastin û pêşxistina ziman, kultur, rabûn û rûniştina me kurdan ê roleka xwe ya mezin hebe.

Mêvanên delal, hûn li wir, em li vir û hinek ji me jî li derên din… Li ku derê dibe bila bibe, bawer bikin şîn û şahiyên we yên me ne. Êş û kêfxweşîyên we jî yên me ne… Ev şeva we, me jî kefxweş dike.

Bi hêvîya rojên xweş û geş em şeva we ya piştgiriyê ji dil û can pîroz dikin.

Mala we ava be!

Li ser navê kovara Bîrnebûnê

Ali Ciftci

www.navekurdi.org

Gotara ji bo kombûna kurdên Anatolîya Navîn li Kopenhagê, 29ê Gulana 2010an

Konferansın açılış konuşması

Mahmut Erdem

Değerli arkadaşlar, değerli konuklar
Bugün burada '*Orta Anadolu Kürtleri*' konulu konferansızmızı yapmak için toplanmış bulunuyoruz. Konferasımıza başlarken, gösterdiğiniz ilgi için hepinize teşekür eder, sizi en içten duygularımla selamlarım.

Avrupanın çeşitli ülkelerinden gelen değerli konuklarımızı ve siz değerli dinleyicileri Skandinavyanın bu güzel kenti Kopenhagda ağırlamak ayrı bir zevk veriyor bana.

Birinci neslin burada 40.yılını doldurduğu ülke, yani Danimarka küçük bir ülkede olsa, siyasette oynadığı rol çok büyüktür. Dünya çapında bir ülkeye ev sahipliği yapmıştır. En son 5-6 ay önce bu ülkede hayata geçen '*Klima Toplantısı*' gibi, yani çevre zirvesi gibi.

Fakat en önemlisi '*Kopenhag Kriterlerini*' hepiniz anımsayınız. İnsan hakları ve demokrasi sorunlarını içeren bu kriterler yine Kopenhagda üretildi, hayata geçti.Ayrıca TCnin bu kriterleri yerine getirmekte ne kadar kararsız olduğunu ve bocaladığını hepiniz farkındasınız.

Benim umudum odur ki bu gün burada yaptığımız '*Orta Anadolu Kürtleri*' konulu konferans bir nebzecikte olsa önümüzü açar. Sorunlarımızın gün ışığına çıkmasında ve çözümünde katkısı olur. Değim yerindeyse bir yol haritası olur. Tabi bunu zaman gösterecektir. Fakat yaşama pozitif bakmak sorunların yarısının çözmek demek.

Değerli arkadaşlar, yakın tarihimiz göçlerle doludur. Çeşitli dünya halkları bulundukları toprakları şu ve bu nedenlerden dolayı terk ederek başka diyarlara göçetmiş veya ettirilmek mecburiyetinde bırakılmışlardır. Fakat bu göçlerden en çok nasibini alan da Kürt halkıdır. Sanki göç alın yazısıdır onun.

Tabi bu göçler keyfi olamamıştır. Zaman zaman egemen güçler tarafından sürgün edilmişlerdir, kimi zaman iç sorunlarından dolayı, kimi zaman daha iyiyi, daha güzeli yakalamak ve yaşam koşullarını yükseltmek için başka diyarlara hep hareket halinde olmuşlardır.

Yani Kürtlerin öküzleri hiç yorulmamış, aksine hep hareket halinde olmuşlar.

Kürtler gittikleri yeni yerlerde yeni sorunlarla karşılaşmışlar ve bu sorunların üstesinden gelmek için büyük çaba ve emek vermişler, kimi zaman bulunduk-

www.arsivakurdi.org

ları çevreden etkilenmişler, kimi zaman da başkalarını etkilemişler. Sözün kısası bazen asimile olup yok olmuşlar, bazen de kendi paralel toplumlarını kurmuşlar. Ama tüm şartlara rağmen bu gün söz konusu olan '*Orta Anadolu Kürtleri*' kültür, örf, ade ve en önemlisi dillerini koruyarak günümüze kadar gelmiştirler. Özelde '*Orta Anadolu Kürtleri*' ve genelde tüm Kürtlerin bu gün var olmaları büyük bedeller karşılığında olmuştur. Yok olmamak için direnmişler, başkaldırmışlar ve savaşmışlar.

Son iki yüz yıldır Osmanlı ve TCye karşı özgürlükleri için başlatılan çeşitli ayaklanma, başkaldırı veya savaşlar günümüze dek devam etmektedir.

Şu anda Kürtlerin içinde oldukları süreç çok nazik ve de önemlidir. Kürt hareketi yükseldikçe karşı taraftan yapılan saldırılar da yükselmektedir. İran da Kürtlere yapılan baskı ve idamlar, Türkiyede seçilmişlerin içeri alınmaları, ve Kürt medyası üzerinde yapılan baskıları örnekleyebiliriz. Onun için baskıları ve saldırılar protesto etmek boynumuzun borcudur ve her demokrat insanın görevidir de.

Kürtler devleti olamayan dünyanın en büyük halkıdır. Tüm çağdaş halklar gibi Kürtler de onurlu bir yaşama her kesten daha fazla layıktırlar. Bu günleri göreceğiz, bu günler yakındır.

Hepinizi selamlarım, tekrar sevgi ve saygılar.

Malpereka nu ya gundê Kelhasan, **www.kelhasan.ch**

Ev malpera, *www.kelhasan.ch* ji aliyê gundiyên ji Kelhasan ku li Îsviçrê dimînin û Fonda Ceneza ya ku bi vê platformê ve girêdayîye, tê çêkirin. Bi rîya vê malpêrê hem agahdariyên komelê û Fonda Cenazê û hem jî gundê Kelhasan bi endamên xwe didin nasandin. Ji bo ku ev bi rêk û pêk înformasyon, dîrok, malbatên gund, çand, folklor, henek/yaranî, klam/stran, lîstîk û çîrokên xwe di vê malperê de berhevkin û biparêzên, lazim e herkesek ji aliyê xwe de, ci dizane ji malperê re bişîynin. Derîyê malperê ji we giştîkaran vekirîye! Eger li ba we; resim/wêne, zanebûna li ser malbata we, video, yaranî, çîrok û wekî din çi hebe, ji malperê re bişînin. Werin, em bi hev re malperê bo pêşeroj û zarokên xwe dewlemend bikin û rind bixemilînin.

www.kelhasan.ch

www.arsivakurdi.org

Gotara ji bo kombûna kurdên Anatolîya Navîn
li Kopenhagê, 29ê Gulana 2010an

KURDÊN DEŞTA ANATOLÎYÊ
-Koçberîyeke Bêrawestî-

NuhAteş

Anatolîya û Kurdistan

Navê Anatolîya bi yonanî ye û tê meneya "Rojhelat". Cografya Anatolîyê li rojhelatê Yonanîstana kevn diket, lowma Yonanên wê demê jê ra gotin "Anatolî". Anatolîya giravekê berve rojavayê ye. Berê, tenê ji hêla wê ya berve rojavayê ra digotin Anatolîya. Dewrana Romayê ji Anatolîyê ra berê "Asya" û paşê "Asya Piçûk" digotin. Van her du navan jî tekebule nîvê Tirkiye yê rojavayê dikir. Osmanîyan ji Anaotoliyê ra digotin “Rum”. Kurdan berê digotin “Rom”. Bi kurmancî huro hen jê ra dibên, "Enedol" hen jî dibên “Anatolîya”. Bi ya min, navê “Anatolîya” hîn rind lê tê. Tirkan navê Anatolîyê helnan û kirin "Anadolu". Li Tirkiyê bi resmî ji avakirina Cumhurîyetê şûn da ji xêyrî Trekyayê her dere Tirkiyê wekî Anatolîya tê bianavkirin. Parçeyê Kurdistanê yê mezin (Kurdistana Bakûr) jî bi ser Anatolîyê da tê berdan û bi navê "Anatolîya Rojhelat" tê heldan. Rastî ew e ku nîşankirina Hududê Anatolîyayê yê berve Cografya Kurdistanê ne hêsen e. Ji ber ku her du cografya bi serhev va ne, yanê berdewamîya hev in.[1]

Li Tirkiyê, Anatolîya mîna navê cografyeke kevn tê naskirin. Lê navê Kurdistanê? Neçebûna tecelîyê ye, ji avakirina Cumhurîyetê vir da navê Kurdistan wekî nav û nîşanên Kurdan yên din tê inkarkirin û rewayî statuyeke resmî nayê ditin. Halbuku navê Kurdistan ji navê Tirkiyê pir kevntir e û ji hezar salî vir da bi qeyîd heye. [2]

Anatolîya ji bo Kurdan cografyake ne yad e. Di navbera cografya Anatolîyê û Kurdistanê da ji çaxên entîk vir da tim û tim dan û standineke piralî heye.

Cografya Kurdistanê di çaxên kevn da kana bajarvanîyê bû. Gavên pêşî yên bajarvanîyê berî 10 û 12 hezar salan li cografya Kurdistanê hatibûn avêtin. Li wir bajarvanî 5 û 6 hezar sala berî mîladê gihêştibû konaxeke bilind. Li çîya û newalên Kurdistanê kedîkirina heywanan û cotkarî û medankarîyê bi hezaran sal di ber ya Anatolîyê destpê kiribû. Ew ji wir derbaze deştên Mezepotamya û Anatolîyayê bûbû. [3]

Anatolîya û Kurdistan di çaxên entîk

www.arsivakurdi.org

û klasîk da şûn û warê bajarvanî û îcad û dewlemendîyên pirçêşîd bûn. Lowma berîyê koçberîyên wê demê, ji Trekya, Kafkasya, Îrana kevn, Asya Navîn û ji Rojhelata Navîn berve van her du cografyan bû. Rêya koçberî û seferberîyên berve Anatolîyê pir caran di ser cografya Kurdistanê ra derbaz dibû û bi xwe ra wêranî û koçberî dianî.

Berî Mîladê Anatolîya kolonîya Kurdistanê bû

Di çaxên entîk û klasîk da xelkên cografya Kurdistanê yên ku wekî ejdadên Kurdan tên hesibandin, nimune Hurî û Mîtanî û Med hatin Anatolîyayê. Wan li wir geh mohra xwe li bajarvanîya wê derê xistin û geh jî ew talan û wêran kirin. Li gorê hen çavkanîyan, Hêtîtên ku li Anatolîyê împeretorîyeke mezin ava kiribûn bixwe jî binecîyên cografya Kurdistanê bûn. Wexta ku Imperetorîya wan li Anatolîyê belav bû, ew berve Kurdistanê kişîyan. Hurî û Mîtanî berî mîladê di sedsala 17an da hatin Anatolîyê û serbajarê Hêtîtan bidest xistin. Wan tesîreke bitîn li ser kultur û mîtolojîya Hêtîtan cihîştin. Medan 500-600 salî di ber mîladê berê Anatolîyayê berve rojhelatê bidest xistin. Hududê dewleta wan digihêştê nava Anatolîyê û wekî ku dîroknas Herodot qalê dike, wan bi Lîdyayîyan va li dorûbera Çemê Sur (Kizilirmak), şerê hevûdu kirin. Medan bi Zêlanîyan va tîfak kirin û ajotin ser Lîdyayê û ew gêr kirin. Hen çavkanî Zelanîyan wekî Kurd didin nasîn. Berî miladê li Kapadokya, Komegan û Pontusê 3 kiraltîyên Zelanîyan hebûn. Di dema serdarîya Farisan da jî Med û Zelanîyan li ser bajarvanîya Anatolîyayê şopên xwe cihîştin. Ji ber van pêkhatîyên demên entîk û klasîk Anatolîya wê demê di hen çavkanîyan da mîna kolonîya Cografya Kurdistanê tê binavkirin.[4] Lê huro jî rewş berwajoyê vê ye. Kurdistan hatiye par kirin û di bin destên xelkê da ye. Tenê pareke piçûk azad e û yên din sewa serbestî û serwerîya xwe li ber xwe didin.

Di hen çavkanîyan da, berî mîladê qala koçberî û surgunîya Kurdan ya berve Kapadokyayê û kevîyên Deryayê Egê tê kirin. Nimûne, eşîra Kardak ji hela Silîvan û Bêdlîsê surgunê Bergameye (Fethîyê) kirine.[5]

Sebebên koçberîyê

Koçberî veqasî tarîxa merivatîyê kevn e. Sebebên vê jî pir çeşîd in. Geh ji ber şer û tofanan û geh jî ber talankarî û zordarîyê yan jî ji bo omdîya jîyaneke serbest û têrqezenc xelk û komên merivan koç dikin û dêv didin warên yad. Kêm û zêde huro jî koçberî ji avrûyên sebebên han da diajo.

Kurd û ejdadên wan ji ber sebeben sîyasî, eskerî, idarî û dewarîyê herdem bi ber derbeyên surgun û koçberiyê ketine. Êrişên koloniyalistî yên hêz û dewletên ji hev cihê û şerên wan yên li ser bi-

www.ersivakurdi.org

destxistin û parvakirina Kurdistanê û berxwedanên Kurdan li dijî wan jî pir caran bûne û dibin sebeba surgun û koçberiyan. Wekî van, şerên Kurdan yên navxwe jî bûne sebeba barkirin û belavbûnan. Di her çaxê da beriyê koçberiya Kurdan yan jî bavûkalên wan ji Rojhelatê berve Rojava û Bakûre Rojavayê bûye.

Çend mîsalên ku li jor û li jêr hatine rêzkirin aşkere dikin ku ji demên entîk û klasîk vir da, Anatoliya bûyê warê surgun û koçberiya Kurdan, bûye welatê wan yê duduyan.

Eşîr û mîrîtîyên kurdan li Anatolîyayê

Paş mîlade jî koçberîya Kurdan ya berve Anatolîya dom kir û dike. Nimûne, ji hen çavkanîyan meriv tê digihê ku Kurd di sedasalên 12 û 13 an da berve Anatolîyê kişîyana û li wir dewletên mîrîtîyê avakirine.

Eşîra Modan (Mudan, Mutkî, Motkî)) sala 1184an li Haymaneyê (Enqere) bi cih û war bûye. Huro sê gundên Modan (Katranci, Saatli, Toycayir) li Haymaneyê hene lê xumalîyên wan xwe Tirk dihesibînin. Navê êşîra Modan li pir derên Anatolîyê din û Trekyayê jî derbaz dibe. Ji kevneşîrên Kurd yên hêla Bedlîsê yek jî Modan e. Modan li Bingolê, Dîyarbekirê û Hamadanê (Îran) jî hene. Navê Modan ehtimal heye ku ji navê Medan tê.[6]

Di nîvê pêşî yê sedsalên 13an di dema Selçukîyên Anatolîyê da, li gorê hen çavkanîyan sewa şikandina serheldana bi navê Baba Îşak û parêztina hududên Selçukîyan li hemberî Bîzansê, eşîra Germîyan li Rojavayê Anatolîyê hatiye bicihkirin. Germîyanî wekî Kurdên Êzdî tên heldan. Wan li wir di sedsala 14 an da dewleteke serbixwe (Mîrdewletek) ava kirin. Germîyan mîrîtîya wê demê ya li rojavayê Anatolîyê bi hêztir bû. Kutehya serbajarê wan bû. Afyon û Denizli jî milkê wan bû. Wê wextê çavên Osmanîyan tim li heyî û şûretîyên seraya Germîyan bû. Wan şaîr û zanayên xwe ji sereya Germîyanan werdigirtin.

Paşê Germîyan bi Osmanîyan va bûn xizmê hev. Serdarê Germîyanan, Şah Suleman keçika xwe, Şah Xatun li Şehzede Beyezîd (Yildirim) mar kiribû. Di pêy Şah Suleman, lawê wî Şah Yakup yê IIan helkişte ser text. Lê ew bê kurik mir (1429) û mirasa Germîyan ji xwarzîyê wî, Murad Sultan yê IIan ra ma. Tê gotin ku di nav Mîrîtîya Germîyan da Turkmen jî hebûne.[7]

Dewleta Selçûkî ya Anatolîyê bixwe jî, wekî pir dewlet û mîrîtîyên wê çaxê pirmiletî bû. Di nav karê dewleta Selçukî da Kurd xwedîyê pareke ne hendik bûn. Bireke mezin ji ordîya Selçukîyan ya kû hêjmara xwe carnan digihêşte 250.000 neferî ji eşîrên Kurd pêyda dibû. Lowma kurdnas Marr ji bo Selçûkiyan dibê, di tebeqayên wan yên jêr da xwîna Kurdan û Tirkan pir tevehev bûye û çêhreya Tirkê li Anatolîyê di

www.arsivakurdi.org

bin tesîra Kurdan da maye.[8]

Di sala 1362an da li Eyaleta Emasyayê bi serdarîya Hacî Şadgelî li ser navê "Hukumeta Kurdan" dewleteke serbixwe hate avakirin. Eyaletên Emasya,Tokad û Canîk (Samsun) di bin destê wê da bûn. Paşê va eyaleta kete bin destê Osmanîyan û bû vîlayeteke wan ya otonom. Di sedsala 16an da ji mintiqeya rojavayê Çorumê ra digotin,"Sereya Kurdan". Di serê sedsala 18an da li vê derê "Qezeya Kurdên Lak" ya serbixwe heye. Kurdên Lak (Lek) li pir dêrên Anatolîyê û Kurdistane hene. Di dawîya hukumdarîya Yavuz Selim da Kurd surgune vê derê û Anatolîya Navin bûne. Rêberê serheldana Celalîyan, Celal jî yek ji van Kurdan bû û di sala 1519an da li Tokadê derketîye meydanê û li ser dînê Yezdanî-Elewî bûye.[9]

Li gorê hen çavkanîyan, Yavuz Selîm piştî sala 1514an da Kurdên Şêhbizeynî ji herêma Kerkukê surgune Haymaneyê (Anqere) kirine. Lê li gorê hen çavkanîyên din Şêhbizeynî 200-300 sali di ber vê li Haymaneyê bi cihûwar bûne.[10]

Di sedsala 17an da Bi heldana hen çavkanîyan, di wexta mîrîtîya Karamanîyan û dema serdarîya Fatih Sultan Mehmet û Yavuz Selîm da li Aksarayê eşîr û gundên Kurdan hebûn. Nimûne, li gorê malumatên deftera Ahkam ya sala 1571an eşîra koçber ya bi navê Espîkêşan li Sultanxahane (Aksaray) bi cihûwar bûye.[11]

Di serê sedsala 17an da êşîra Doykan (Doqan) ji hêla Semsurê (Adiyaman) hatiye li Yunakê (Konya) êwirîye û paşê barkiriye Aksarayê û li wir bi şûn bûye[12]

Kurdên Canpolad yên ku li herêma Kîlîsê xwedîyê text û tac bûn, di sedsalên 17an da li Anatolîyê jî bi hukim bûn û di serheldana Celalîyan da roleke sereke lîstibûn.[13]

Li gorê malumatên di dest me da, meriv dikane bibê, eşîrên Reşî û Canbegî jî tevê, piranîya bavûkalên Kurdên Deşta Anatolîyê yên ku huro kêm û zêde nîşanên kurdîtîyê diparêzin, di sedsalên 18 û 19an da hatine Anatolîya û li wir di çarçiveya sîyaseta serdarîya Osmanîyan ya li ser xumalîkirina eşîrên koçber hatine bişûnkirin.[14]

Li pêy van nimuneyan va pirsa tê pêş: Ma Kurdên dema Selçûkîyan, nimûne Germîyan çir bûn yan jî nivşên ku bi pê wan ketî kî ne? Weng xuya dike ku ji wan nivşên ku nav û nişanên kurdîtîyê li ser mane kesek nemaye. Lê hen çavkanî balê dikşînîn ser wekhevbûna hen sembol û edetên Kurdên Êzdî û Textecîyên elewî yên ku huro li herêma Egeyê jî dijîn. Yanê ji ehtimalê ne dûr e ku Textecî yan jî komek ji wan newîyên Germîyanan bin.[15] Yên berî mîladê berdin, Kurdên Anatoliyê yên dema Selçûkîyan nişedên xwe yên etniki, minak ziman û kultura xwe wenda kirine. Nivşên wan wekî Kurd tunîn û di nav nifusa Tirkan da helîyane.

www.arsivakurdi.org

Li duv van malumatên li ser vê xalê, huro pirsa rewayi mineqeşekirin û bersivdayînê ev e:

Ma eynê halûhewala bê serê Kurdên Anatoliyê yên dema me jî? Yan jî sewa ku Kurdên Anatoliyê yên huro, mina yên dema Selçukiyan kurditî, ziman û kulture xwe wenda nekin, li welêt û dervayî welêt çi gerek e bê kirin?

Kolonîya Kurdên Deşta Anatolîyê

Li ser cografya Anatolîya piçûk û mezin li pir deran kolonîyên Kurdan hene. Îzady Kurdên Anatolîya Navîn wekî du koloniyên bi xusûsiyêtên xwe yên xas heldide.[16]

Yek ji wan li Bakûrê Anatolîya Navîn (Yozgat-Çorum-Emasya-Tokad) e. Kurdên vê kolonîyê Elewî ne, bi zaravayê kurmancî deng dikin.[17]

Kolonîya din, Kurdên li bakûrê Gola Xwê (Cîhanbeylî-Yunak-Haymana) yên ku huro di nav hudûdên Bajarên Enqere û Qonyayê da ne. Meriv dikane Kurdên bajarên Kirşehîr û Aksarayê jî teve vê kolonîyê bihesibîne. Vê kolonîyê 270 gund û qesabeyên xwe yên Kurd hene. Hêjmara xumalîyên wê di ser 300 hezarî ra ye. Ew bi sê zaravayên kurdî, (kurmancî, dimilkî/zazakî û şêxbizinkî) deng dikin. Piranîya wan muslumanê henefî ne.[18]

Realîteya me ye, gava ku em em qala Kurdên Anatolîyayê dikin, ku nexwazin jî, em li ser Kurdên Konya, Enqere, Kirşehr û Aksarayê, di ber gîştkan ji li ser yên Qonyayê deng dikin. Ji ber ku hêjmareke mezin ji koçberên Anatoliyê yên li welatên Ewropayê ji vê koloniyê ne, pirtir ji gundên Kurdan yên bi ser bajarê Qonyayê va ne. Meriv dikane vê koloniyê wekî "Kurdên Deşta Anatolîyê" jî binav bike.

Çarçiveya vê gotarê rê nade ku ez li ser her kolonîyeke Kurd li Anatolîyê deng bikim. Jixwe di derheqa wan da malumatên kurûhur jî di destê min da tunin. Heqe xwe ye ku her kolonîyek li gora bişîyakirin û ehtiyacên xwe derkeve pêş. Lowma ez ê li wir li ser kolonîya Deşta Anatolîyê deng bikim û berê dixwazim çend xusisiyetên vê kolonîyê heldim.

Eger meriv kolonîya Deşta Anatolîyê bi yên din va bi rû hev da, yê bibîne ku ew ê ji hêla cografya û hêjmara nifusê da ji gîştkan mezintir e û ji pir hêlan da aktiv e. Ew ê him ji hêla ekonomîyê û koçberiya Ewropayê da û him ji hêla kar û xebatên sîyasî û kulturî da dinamîk e.

Di nav cografya vê kolonîyê da Kurd ne bi tenê ne. Li wir gund, qeseba û qezeyên ku Tirk,Teter û Çerkez li dijîn jî hene. Li hen derên vê kolonîyê Kurd piranî û li hen deran jî hendikanî ne.

Li piranîya gund û qesebayên Kurd yen vê kolonîyê Kurd bi serî xwe ne, di nav wan da, ji xêrî îstisna miletên din tunin. Herçiqas li ser hêjmara Kurdên vê kolonîyê qeyidên resmî tune bin jî, gund û qeseba jî tevê, bi tehmîn ji nifusa qezayên wekî Haymane (Enqere)

www.arsivakurdi.org

û Kulu, Cihanbegli û Yunakê (Qonîya) para mezin Kurd in. Li vê kolonîyê zewacên di navbera Kurdan û miletên din da tunin yan jî pir kêm in.

Di ber hatina Kurdan Deşta Anatolîyê di pir cîyan da betal bû. Deşta Anatolîyê deşteke bilind û fereh e. Ew ê bozqir û kêmbaran e. Ku yekî yad lê mêz bike yê bibê, va çi çoleke xewle û wêran e. Lê di wexta xwe da bi sedan kerîyên pêz jê bigihan bûn. Kî dizane, belku sewa vê eşîrên Kurd li wir mane û venegerîyane milke bavûkalan.

Piçûk û mezin, bi dehan eşîrên Kurd yên koçber û nîvkoçber bi kerîyên xwe yên pêz va di wexta xwe da li nava Anatolîyê hatine bicihkirin. Di serî da kon vegirtin û demeke şûn da her eşîrekê ji xwe ra gund avakirin. Di destpêkê da wan dewara xwe bi pêz dikirin û paşê destpê cotkarîyê kirin.

Di wexta xwe da ew ê ji hêla pezxwedîkirin û pêzfirotinê da jîrek û bi nav û deng bûn. Bazarên heywanan yên Enqere û Stembûlê ji kerîyên wan yên nêr bigîhan bûn. Ji hêla Standin û bikaranîna makîneyên zevîyan, trektor û kamyonên barkêşî yên bi merqeyên giran da jî wan serî dikşandin.[19]

Kurdên Deşta Anatolîyê bi sedan sal li ser tevger û qeydên eşîrtîyê rabûn û rûniştin. Meriv dikane bibê, di sîya tevgera eşîrtiyê da navûnîşan, ziman û kilamên wan hetanî huro man. Bi gotineke din, tevgera eşîrtîyê ji ziman û folklora kurdî ya li Anatolîya Navîn ra bû star.

Di salên 50 û 60î da jîyana Kurdên Anatolîya Navîn ya ekonomî, sosyalî û kulturî ji binî da destpê guhêrîne kir û xeraw bû. Nifus zêde bû. Ji ber sebebên sîyaseta aborîyê xêra pezxwedîkirin û cotkarîyê nema û êdî tenê bi wan dewar nedibû. Lowma wan sewa xwandin û şixulînê barkirin bajaran û welatên Ewropayê.

Li ba Kurdên Anatolîya Navîn hetanî salên 50 û 60î nasnameya eşîrtî û qebîletîyê li pêş bû. Wan xwe di nav xwe da bi vê nasnameyê didan naskirin. Bi vê xwe ji hev cihê dikirin û xwe di ser hev ra didîtin. [20] Wan kurmancbûna xwe venedişartin, lê ew kêm derdixistin pêş. Ew ê ji hîs û fikrên milî dûr bûn. Wan hay jê tunekirina zimanê kurdî bi reya perwerde û weşanên bi tirkî tune bû. Sewa parêztin û qebulkirina kurdî ji hêla resmî da tu xwaztek, liberxwedan û serilêdanên wan tune bûn. Mezin û rêberên Kurdan yên wê demê, ji ber tirs û nezanîyê li hember sîyaseta tunekirina ziman û nasnameya kurdî neçar û bêdeng man.

Nifşên wan yên ku bi rêya xwandinê û çûyîna bajar û xerîbîyê di salên 60/70î da heşyar bûn û hereketa kurdî ya nû nas kirin û di refên wê da cih girtin.[21]

Lê wan jî di sêrî da pirtir kar û xebata sîyasî û îdologî dan ber xwe. Wan jî şik nebirin ku li ser tarîx, ziman û kultur û berhemên edebîyata devkî yên cîhûwarê xwe xebatekê bikin û ji bo vê dezgehên mîna komele û weqif danin. ji

www.arsivakurdi.org

xêyrî îstîsna, tu kesî serê xwe bi xwandin û nivîsandina bi kurmancî ra nediêşand û ji xwe ra ne dikire derd ku eserên edebîyata devkî ya cîhûwarê xwe berhev bike û biweşîne. Vê nivşa şoreşger hay je edebîyata xelkê hebû, lê ji ya xwe bê yan jî kêm hay bû.

Huro li ba Kurdên Deşta Anatolîyê jî nasnameya kurdîtîyê derketîye pêş, ew xwedî li wê derdikevin. Lê dîsa jî ecêb e ku huro jî li gund û qesebayên Kurdên Anatolîyê liberxwedan û dezgehên ku parêztin û hevisîna xwandin û nivisandina bi kurdî ji xwe ra kirine armanc tunin. Li hember tofana zimankûjî ya ku ji 80 salî vir da bi ser kurdî tê xwarê, civata Kurdan Anaotolîyê huro ji bi giranî bêdeng û bê berxwedaneke sivil e.

Kar û xebata bi vî rengî bi derengî, ji salên 90î bi şûn da û pirtir jî bi derketina Kovara Bîrnebûnê li dervayî welat destpê kir. Lê gerek e bê gotin ku tenê bi kovarekê meriv ji bin vî karûbarê giran dernakeve.

Giregirên Kurdên Anatolîyê ji xêr û xwaşîyan ra li ser xwe ne. Li gundên xwe ji bo çêkirina mektewên bi tirkî destfereh ne. Ji çêkirina camîyan yên ku tê da li hêla îbadetê, ziman û kultura ereban tê belavkirin ra devê kesikê wan tim ji hev kiriye. Lê ku qal tê ser avakirina weqif yan dersxaneyeke kurdî, pirê wan xwe ji wan deran nakin û xwe vir da û wê da badidin.

Li dawîya vê xalê heqê xwe ye ku bê gotin, ku hen xususîyêtên Kurdên Anatolîya Navîn, xususî yên di derheqa xwedî li nasnameya kurdî derketin yan jê bi dûr ketin bi pisîkologîya komhendikanîyê û sîyaseta tunekirina nasnameya kurdî bi rêya asîmîlesyona bi darê zorê va giredayî ne.

Barkirina Kurdên Deşta Anatolîyê ya Ewropayê

Barkirina Kurdên Anatolîya Navîn ya duyemîn di salên 60î da destpê kir û hîn jî dewam dike. Vê cara, wan berê xwe dana bajarên Tirkiyê yên wekî Enqere, Qonîya, Qirşehr, Ekserey, Stembul û welatên Ewropayê. Vê carê kurd ferd bi ferd û mal bi mal bar dikin û her yek dihere derekê.

Li ba Kurdên Deşta Anatolîyê çûyîna Ewropayê bûyê rêya "xelasbûnê" û bûye omdiya pir xort û keçikan. Pareke mezin ji Kolonîya Deşta Anatolîyê, di ber gîştkan jî yên ji hêla Qonyayê li Ewropayê ne û yên mayî jî her roj bi hesreta çûyîna Ewropayê radibin û rûdinin. Tê bibejî ew ê bûne "Ewropakêş".

Sebebên ku pirtir koçberîya kiş dikin pereyên Ewropayê biqimet û standartên wê yên soyal in. Koçber bixwe jî koçberîyê teşwîq dikin. Yê ku çûyê Ewropayê, li tetîla havînê di bin da tomefîleke merqegiran tê gundê xwe û xanîyên mezin dadine û xagîya dike.Yê ku li gund mayî li wî mêz dike û ew jî berê xwe dide Ewropayê.

Havîn êdîn li gundên Kurdên Anatolîyê demsala zewacê ye. Her

www.arsivakurdi.org

havinekê li her gundekî deh û panzdeh dol li rû hev lê dikevin. Ji van zewacan pirê xwe sewa xatirê koçberîya Erwopayê ne. Meriv dikana van dohl û dawetan mîna "pêşbazîya zewacên koçberîyê" binav bike.

Barkirina û koçkirina bivê dîmensîyonê binetara xwedîkirinê li Deşta Anatolîyê ya li ser mirasa bav û kalan xeraw kir. Wê zemînê hebûna Kurdeyatiyê li gorê edet û toreyên berê ji ortê rakir. Ew dibe sebeba dûrketina ji milkê bavûkalan û belavbûna malbat û mermalîyan. Va jî bi xwe re wendabûn û bîrbûna zimên tîne. Belku ew di pêvajoyeke dûr û dirêj da bibe sebeba wendabûna nasnameya kurdîtîyê jî.

Komeke mezin ji Kurdên Deşta Anatolîyê li Ewropayê bi cih û war in. Ew ê êdîn ji Ewropayê bigihanin û dahatûya wan bi Ewropayê va girêdayî ye. Li hen bajarên welatên wekî Swed, Danemerqa, Elmanya, Awisturya, İswicreyê kolonîyên Kurdên Anatolîyê hene. Va jî fersanda parêztina nasnameya kulturî û zimanê dayikê bi xwe ra tînê. Lê fersend bixwe nayên nekevin hembêza merivan. Fersend ji bo bidestxistinê hene û ji vê ra jî qîretkarî, fedekarî û sazîyên wekî komele û însîyatîfên dêûbavan gerek in.

Ji Kurdên Anatolîyê yên li Ewropayê hêjmareke ne hendik di nav rêxistinên Kurdistanî yên li welatên Ewropayê da aktiv in. Bi rû da li hen bajarên Ewropayê komeleyên Kurdên Anatolîyê li ser navên gundên wan hene û karên sosyal û kulturî dikin. Lê liberxwedan û hewldanên wan yên ji bo parêztin û pêşvabirina zimane daykê kêm in. Va kêmanîya di rûpelên wan yên înternetî da jî bi ber çavan dikeve.

Di saye koçberîya Ewropayê da, Kurdên Anatolîyê dûnyake nû naskirin û bi xwaşî û talîyên wê va rûbirû dibin. Di saye Ewropayê da Kurdên Anatolîyê Kurdên cîran yên ji gundên cîran û Kurdên ji welat û herêmên din naskirin.

Serbestî û demokrasîya welatên Ewropayê rê vekir ku Kurdên Anatolîyê jî li Ewropayê bikanîn serbest li nasnameya xwe xwedî derkevin û ji ziman û tarîxa xwe hayadar bibin.

Helbet koçberên Kurd bi ber derbeyên vê "xwaşxerîbîyê" jî dikevin. Ji hêlekê da êş û derdên xerîbiyê dikşînin û ji hêla din da dibin hedefa lome û lêdanên nijadperêstan. Ew ê ji hêla heqan va jî kêmpar in. Ji bo vê jî lazim e ku koçber xwe biparêzin û teve xebatên civatî û sosyalî bibin û li heq û hukukên xwe bigerin. Ji ber vê, rewayî gotin û pesandinê ye ku di van salên dawîyê da, Kurdên Anatolîyê li Danemarkeyê di nav partîyên sîyasî da û di meclisên beledîyan û parlamenan da cih girtine.

Li dawîyê gotarê, bi van xalan va girêdayî du pirsên din yên ku huro em li ser hur bibin û minekeşe bikin ev in:

1. Ma fersendên hêvisîna xwandin û nivîsandina bi kurdî li Danemerqayê

www.arsivakurdi.org

û li welatên din yên Ewropayê çi ne û Kurdên Aanatolîyê çiqas ji wan istîfade dikin?

2. Ma sewa ku ew ji fersendên heyî hîn rindtir istîfade bikin, çi gerek e bê kirin û organîzesyonên çing lazim in?

Çavkanî:

[1] Enzyklopädie des Îslam www.eslam.de/begriffe/a/anatolıen.htm, Rohat Alakom, Orta Anadolu Kürtleri, rûpel 11-12, Kemal Burkay, Geçmişten Günümüze, Kürtler ve Kürdistan, rûpel 7-12, Mehrdad R. İzady, Kürtler-Bir El Kitabı, rûpel, 26-38

[2] Kemal Burkay, Geçmişten Günümüze Kürtler ve Kürdistan, rûpel 7

[3] Mehrdad R. İzady, Kürtler - Bir El Kitabi, rûpel 63-70, Ferdinand Hennerbichler, Die Kurden, rûpel 141-143

[4] Andrew Collîns, Meleklerin Küllerinden, rûpel, 358, Mehrdad R. İzadî, Kürtler- Bir El Kitabi, rûpel, 79-97, Herodot, Das Geschichtswerk des Herodot von Halikarnassos, rûpel 53, Kemal Burkay, Geşmîşten Günümüze Kürtler ve Kürdistan, rûpel 61- 64, Cigerxwîn, Tarîxa Kurdistan 1, rûpel 93, Ekrem Akurgal, Anadolu Kültür Tarihi, rûpel 52, 179

[5] Mehrdad R. Îzady, Kürtler-Bir El Kitabi, rûpel 198-199

[6] Halil İbrahim Uçak, Tarih İçinde Haymane, rûpel 147, Cevdet Türkay, Oymak,
Aşiret ve Cemaatlar, rûpel 123, 590, Şerfxanê Bêdlîsê, Şerefname, Tarîxa
Kurdistan ya kevn, rûpel 378, 381. M. Emin Zekî, Kürdistan Tarihi, rûpel 23, Mehrdad R. Îzady, Kürtler - Bir El Kitabi, rûpel 175

[7] K. Mezher Ehmed, Çend Rûpel Ji Dîroka Kurdî, Rûpel 34- 45, Doğan Avcioglu, Türklerîn Tarîhî, rûpel 2059, 2263-2275, Zorabê Bûdî Aloîan, Pirsa Hoza Germîyan, Bîrnebûn, hêjmar 26, rûpel 44-45, Kemal Burkay, Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kürdistan, cilt 1, rûpel 167-170, Şoreş Reşî, Dîroka Kurdên Koçber, I, rûpel 257, 268 - 275

[8] Bazil Nikitin, Kürtler, rûpel 323, K. Mezher Ehmed, Çend Rûpel Ji Dîroka Kurdî, rûpel 41, Şoreş Reşî, Dîroka Kurdên Koçber, I, rûpel 254- 259

[9] Doğan Avcioglu, Beşinci Kitap, rûpel 2184-2186, Mehrdad R. İzady, Kürtler-Bir El Kitabi, rûpel 116, 191, Rohat Alakom, Orta Anadolu Kürtleri, rûpel 62, 64, Cevdet Türkei, Oymak, Aşiret cer Cemaatlar, rûpel, 114, 569, Şerefhanê Bedlîsê, Şerefname, Tarîxa Kurdistan ya Kevn, rûpel 343, M. Emin Zeki, Kürdistan tarihi, rûpel 23-24, Şoreş Reşî, Dîroka Kurdên Koçber, I, rûpel 243 - 245

[10] Nuh Ateş, Li Ser Şêxbizinên Haymaneyê û Koka Navê Wan, Bîrnebûn, hêjmar 41, rûpel 24-25

[11] Ömer Lütfü Barkan, Osmanli İmparatorluğunda Bir İskan ve Kolonizasyon Metodu olark Vakiflar ve Temlikler, rûpel 355

[12] Memê Hilkecikî, Yavruvatan Hilkecik: Aksaray Kürtleri`nin Serüvenî, Bîrnebûn, hêjmar 7, rûpel 73 – 77

[13] Faruk Sümer, Oğuzlar, rûpel, 153 – 153

[14] Rohat Alakom, Şarktan Her Zaman Güneş Doğmaz, Orta Anadolu Kürtleri, rûpel 55 –72, Kenan û Muzaffer, Yunak Kürtlerî, Bîrnebûn, hêjmar 11, rûpel 24, Dr. M ikaîlî, Tarîxa Eşîra Mikaîlîyan, Bîrnebûn, hêjmar 23, rûpel 35-48 û Şecera Maleke Kurdên Polatliyê, Bîrnebûn, hêjmar 20, rûpel 68, Nuh Ateş, Halikan ve Reşwanların Kökeni üzerine ...., Bîrnebûn, hêjmar 19, rûpel 61 û İç Anadolu Kürtleri, rûpel 26-34, Vahit Duran, Kırşehrin Başka bir yüzü: Kürtler, Bîrnebûn, hêjmar 6, rûpel 12 – 13, Ferîdun, İç Anadolu Kürtleri, Bîrnebûn, hêjmar 4, rûpel 6– 7, Reşwanlar (Reşî) www.kurdenkırsehire.com/dirok/resi3/, Ali Çiftçi, Kelhesen, Bîrnebûn, hêjmar 30, rûpel 33, M. Şirin Dağ, Altılar, Bîrnebûn, hêjmar 21, rûpel 35-41, Necati Kanoğlu, Têrıkan Aşireti Üzerine, Bîrnebûn, hêjmar 20, rûpel 71-74, Mıla Kara, Islahiye´den Kırşehire Mala Xalî Reşê´nın Uzanan Öyküsü, Bîrnebûn, hêjmar 18, rûpel 4, Stefan Winter, 17.-18.yy´da Kuzey Süriye´nin Göçebe Aşiretleri Örneğinde Osmanlı Sosyal Disiplin Çabaları, Bîrnebûn, hêjmar 24, rûpel 63-65, Mahmud Lewendî, Kurdên Şêxbizinî, Bîrnebûn, hêjmar 3, rûpel, 78-98, Mehmet Özkök, Haymana Şeyhbizinlari, Bîrnebûn, hêjmar 4, rûpel 15-25, Şoreş Reşî, Diroka Kurdên Koçber, II, rûpel 186-325, Faruk Sümer, Oguzlar, rûpel 154-155

[15] Klaus E. Müller, Kulturhistorische Studien zur Genese Pseudo-İslamischer Sektenbilde in Vorderasien, rûpel 370 û Zorabê Bûdî Aloîan, Pirsa Hoza Germîyan, Bîrnebûn, hêjmar 26, rûpel 44 - 45

[16] Mehrdad R. İzady, Kürtler -Bir El Kitabi, rûpel 41

[117] Ali Biçer, İç Anadolu`da Unutulmuş Bir Kürt Kolonisi, Birnebûn, hêjmar 1, rûpel 66 – 74

[18] Nuh Ateş, Koma Kurdên Anatolîyê..., Birnebûn, hêjmar 11, rûpel 13, û Nuh Ateş, İç Anadolu Kürtleri, rûpel 44-56, Rohat Alakom, Orta Anadolu Kürtlerü, 50- 67

[19] Nuh Ates, İç Anadolu Kürtleri, rûpel 69

[20] Rohat Alakom, Hevpeyvîn Bi Ayşe Yıldırım va, Bîrnebûn, hêjmar 21, rûpel 93-96, Seyyah Kandemir, Ankara Vilayeti, Bîrnebûn, hejmar 7, rûpel 42,

[21] N. Ateş – M. Özgür, Kürt Ulusal Mücadelesinde Orta Anadolu Kürtleri, Bîrnebûn, hêjmar 19, rûpel 22 – 27,

www.arsiv.kmm.org

Gotara ji bo Kombûna Kurdên Anatolîya Navîn
li Kopenhagê, 29ê Gulana 2010an

Yekîtiya Ewropayê û kurd

Nebî Kesen

Mêvanên hêja, hevalên delal, axêferan berî min li ser gelek babetan dîtin û pêşnîyarên xwe gotin. Niha sire hat babeta "*Yekitîya Ewropayê û Kurd*". Wek tê zanîn, YE di sala 1993an da biryara li ser *Kirîterên Kopenhag*ê li vî bajarî derxist. Niha jî em li vî bajarî civînê dikin. Biryarên Kopenhagê yên YEyê him bo Tirkiyê him jî bo me girîng bûn û niha jî di rojevê da ne.

Di vê dema kurt de çend aspektên girîng li vir bînim ziman. Yekitîya Ewropayê, ji çar alîyan ve bo me girîng e. Û pêwist e ku kurd xwedî helwest û projeyan bin:

- Têkilîyên Tirkiyê û YE, bi vê ra girêdayî, pirsgirêka kurd
- Sîyaseta YEya kurd û Kurdistanê
- Sîyaseta kurdan ya YE
- Koçberên kurd li dewletên YE

Eleqeya her çar aspektan bo û bi kurdên Anatolîya Navîn ra heye û divê ev jî îro bên berçav û niqaş kirin. Mixabin heta niha kurd û tevgera kurd li ser vê aspektê nesekinîn û bê konsept man. Ji alîyê din, rastîyek jî heye ku kurdên Anatolîya Navîn jî serê xwe bi vê ra neêşandin. Kêmasîyek me ya din jî dixwazim bînim ziman: kurdên ji Anatolîya Navîn yên li Ewropayê ku ji dehan salan vir de li wir dijîn, pirs nekirin ku YE, têkilîyên YE û Tirkiyê û manaya van bo kurdên Anatolîyê çi ye?

Tarîxa têkilîyên YE û Tirkiyê gelek dirêj e. Li ser vê dixwazim çend bûyerên girîng bînim bîra we. 1964an de Peymana Hevparî (Peymana Enqereyê) di navbena Yekitîya Aborî ya Ewropa û Tirkiyê da dest pê kir. Piştî 32 salan, di 1996an de Yekitîya Gumrikê çêbû. Li 1999an YE, statûya berendametîya Tirkiyê qebûl kir. Ji 2005an vir de ye muzakereyên endametîyê têne berdewamkirin. Prensîb, naverok û metoda muzakereyan ji alîyê YE ve hatin tespîtkirin. Di 35 beşên li ser aborî, hiqûq, çandî û cîvakî muzakere berdewam dikin. 18 beş ji alîyê dewletên YE hatine blokekirin. Yek beş (zanyarî-lêkolîn) temam bû û di 11 beşan de muzakere dest pê kir, lê hîn jî vekirîne. 5 beşên muzakereyan divê di dema pêş de bên vekirin. Muzakere sist û bi probleman ra gîrêdayî derbas dibin.

www.arsivakurdi.org

Ji biryara YE ya Helsînkî vir de, bi endametîya Tirkiyê ra gîrêdayî, gotûbêj li ser hinek babetan tê kirin. Ev babet bi piranî di Şertên Kopenhagê da jî bo endametîyê cîh girtine. Îxtîlafa Kibrisê ku pirsgirêkek navnetewî ye, roleke negatîf li ser muzakereyan dike. Wek tê zanîn, ji bo kurdan Şertên Kopenhagê li Tirkiyê bi temamî cîh negirtine, lê YE sala 2005an wek cih girtî qebûl kir û biryara destpêka muzakereyan girt. Ew babetên ku hîn jî di rojevê da ne, ev in:

- Demokrasî û dewleta hiquq
- Maf û azadîya mîrovan
- Rola ordîyê di sîyaseta Tirkiyê da
- Kemalîzm û îdeolojîya fermî
- Mafê kêmnetewan (mînorîteyan)

Mêvanên hêja, hevalên delal, di têkilîyên YE û Tirkiyê da, pirsgirêka kurd wek "pirsgirêkek hindurî"ya dewletê tê qebûlkirin. Di çarçeveya maf û azadîyên mîrovan de daxwazên YE hene. Ev jî bi piranî li ser xebatên sîyasî û çandî yên kurdan li gor şertên dewletek demokratîk tên formulekirin. Ji alîyê din, YE herdem daxwaza çareserkirina îxtîlafa şer anî ziman û rêya sîyasî bo vê pêşnîyar kir. Mixabin YE heta niha Tevgera Kurd wek muheteb qebûl nekir û rêxistinek wek PKK jî "terorîst" bi nav kir.

Dîtina ku di nav dewletên YE de cih girtîye ew e ku qebûlkirina mafên mirovan û kêmnetewan bo kurdan ê pirsgirêka kurd çareser bike. Sîyasetek YE li ser statûya kurdan li Tirkiyê hîn ji tune. Bi veşartî behsa kurdan wek grûbek kêmnetewan bibe jî, em dizanin ku kurd netewek in û mafê qedera xwe tayîn kirin (self-determination) heqê me ye. Pêkanîna daxwazên YE ê tesîrek pozitîf li ser rewşa hemû kurdan bilîhîze, lê pirsgirêka kurd bi temamî çareser nake.

Pêvajoya (prosesa) muzakereyan li Tirkiyê ji alîyê demokrasî û dewleta hiquq guhertinan (reforman) bi xwe ra tîne. Ji sala 2002an vir de 8 paketên mezin yên guhertinan pêk hatin. Tirkiyê wek dewletek berendam, hin jî mecbûr e ku di beşên aborî, hiquq, civakî û navnetewî da gelek qanûn û rêznameyan biguhare. Şertên Kopenhagê yên li ser sîyaset, hiquq û aborî hîn jî bi cih nebûne. Em divê guhartinan bizanin û pêşnîyarên xwe bînin ziman.

Mêvanên hêja, hevalên delal, wek tê zanîn, têkilîyên YE bi kurdan ra tune. Muxatabê YE dewleta Tirkiyê ye, lê kurd dîsa jî dikarin tesîran li ser têkilîyên duteref bikin. Çima ku biryarek Komîsyona YE ji sala 2005an vir de heye: YE dixwaze ku li Tirkiyê civata sîvîl jî di pêvajoya nêzikbûnê da rola xwe bilîze. Bona vê giranîyek xebatên YE li Tirkiyê, bi hevkarîya rêxistinên Ewropî û şaredarîyan û rêxistinên civata sîvîl ve gîrêdayî ye. Şaredarîyên bajarên Kurdistanê wek Amedê di vî warî da hinek tecrûbeyên têkilîyan kirin û ji

www.arsivakurdi.org

rêxistinên YE alîkarî ji girtin. Lê ev xebat hin jî kêm in û divê pir bin. Ji salan vir ve ye hinek kurd bala du aspektan di têkilîyên YE û Tirkiyê da dikşînin. Divê li vir herdu aspekt carek din bên gotin:

Yekem: Civata kurd û Tevgera Kurd divê guhartinên li Tirkiyê yên nêzikbûna YE pirtir teqip bikin û bi pêşnîyaran kêmasîyên sîstema sîyasî, aborî û cîvakî ya Tirkiyê eşkere bikin. Bi vî awayî, kurd dikarin pêvajoya muzakereyan biguharin yan jî tesîrekê li ser wê bikin. Menfaat û daxwazên kurdên Anatolîya Navîn jî dikarin di vê çarçeveyê da bên ziman.

Duwem: Stratejîya YE ya nêzikbûna (entegrasyona) Tirkiyê, stratejîyek bo demek direj e. Tekoşîna kurdan bo mafên netewî jî yê demek dirêj hîn bê berdewamkirin. Armanc û menfaatên YE û daxwaz û stratejîya kurdan ji hev cûda ne. Lê ew nayê wê maneyê ku kurd di pêvajoya muzakereyan da bê konsept û daxwaz bisekinin. Pêşveçûna Tirkiyê ji alîyê dewletek demokratîk û hiquqî bo kurdan jî bûyerek girîng e. Maf û azadîyên mîrovan û kêmnetewan bo kurdan jî pêwist in û tevgera kurd dikare di şertên demokrasîyê de xebatên sîyasî baştir pêk bîne. Bona vê, stratejî û daxwazên YE li ser demokrasî, maf û azadîyê ji Tirkiyê bo menfaatên kurdan in.

Em hemû dizanin ku daxwazên kurdan yên sîyasî hîn jî ji alîyê dewletên din wek Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA) û endamên YE nayên qebûlkirin. Rastîyek din jî ew e ku YE bi dewletên berendam re, niqaşa pirsgirêkên netewî di hundurê van dewletan da nake. Mafê YE ya mudaxale tune. Loma divê Tevgera Kurd têkilîyên xwe li ser zanîn û esasa wê prensîba YE pêk bîne. Pêwist e ku di stratejîya kurdan de armancên nêzikî û dûrî ji hev bên cûdakirin. Armancên nêzikî yên kurdan, ji alîyê YE de jî tên ziman. Daxwazên kurdan yên tên zanin piranî li ser qebûlkirina nasnameya kurd, mafên zimanê zikmakî û çanda kurdî ne. Di çarçeveya van daxwazan da, partî û rêxistinên kurd, şaredarîyên bajarên kurd û kurdên li Ewropayê dikarin hevkarîyê bi rêxistinên YE ra dest pê kin û pêş ve bibin.

Mêvanên hêja, hevalên delal, pirsgirêka kurd pirsgirêkek sîyasî ye û çareserkirina wê di navbena kurdan û dewleta Tirkiyê da mimkun e. Rewşa kurdên Anatolîya Navîn jî bi vê pirsgirêkê ra girêdayî dikare bê guhertin. Maf û azadîyên sîyasî û çandî, di pêvajoya berendametîya YE de pir giran tên firehkirin. Statûyek bo hemû kurdan ku kurdên Anatolîya Navîn jî di nav da ne, wek kêmnetew jî nayê qebûlkirin. Bona vê, divê em rexne û pêşnîyarên xwe bînin ziman û daxin rojeva YE û Tirkiyê. A ku tê xuyakirin, hinek kêmasîyên tevgere kurd di vî warî de hene.

Di van penc salên dawî de, Tirkiyê, di pêvajoya muzakereyan da pir hindik gavên demokrasîyê avetin û YE jî "stratejîya nêzikbûnê" baş pêk nehanî. Bo

www.arsivakurdi.org

gelê kurd, li Tirkiyê ji alîyê rewşa sîyasî û mafên çandî guhertinên mezin derneketin holê. Şerê çekdarî di navbena gerîlayên PKKê û arteşa tirk de dîsa dest pê kir. Daxwazên tevgera kurd hîn jî ji alîyê hikûmet û dewleta Tirkiyê nayên qebûlkirin. Bi gotinek din, di pêvajoya muzakereyan da heta niha bo çareserkirina pirsgirêka kurd tu tişt nehat guhertin. YE jî di vê îxtîlafê da naxwaze rolekê bilihîze. Pirsa ku li vir em bikin ev e ku çawa kurd li ser YEyê tesirekê bikin û helwesta wê biguharin. Xebatên tevgera kurd û kurdên li Ewropayê jî bê tesir man.

Têkilîyên YE û Tirkiyê, mixabin van salên dawî ji rojeva kurdan derket. Va helwesta, ne rast e û bo menfaatên kurdan ne baş e. Pevajoya muzakereyan û stratejîya nêzîkbûnê tên çi manayê û di kîjan merhaleyê da ne, divê em ji xwe pirs bikin. 35 beşên muzakereyan di rojeva nêzikbûnê da ne û pirranîya van beşan kurdan jî eleqe dike. Partî, rêxistin û şaredarîyên kurdan divê van tiştan bizanin, xwedî pêşnîyaran bin û bînin ziman.

Tevgera kurd ji alîyê mafên kurdên Anatolîya Navîn ku ew di statûya kêmnetewek otokton (cîhgirtin) da ne, bê konsept e. Mafên kêmnetewan yên çandî (dersên bi zimanê dê, parastina berhemên tarixî û çandî hwd.) li Tirkiyê bo kurdên Anatolîya Navîn jî divê bên qebûlkirin. Bê helwest û daxwazên kurdan, dewleta Tirkiyê gavan navêje û YE jî nabe berdevkê kurdên Anatolîya Navîn. Ji alîyê din divê kurdên Anatolîya Navîn jî him piştgîrîya daxwazên tevgera kurd bikin û him jî xwedî daxwazên bo xwe bin û pêşnîyaran bikin.

Mêvanên hêja, hevalên delal, gotara xwe dixwazim bi çend pêşnîyaran bigrim:

Komîsyonek kurdan ya netewî li ser têkilîyên YE û Tirkiyê divê hebe. Pêwist e ku kurdên Anatolîya Navîn û kurdên dîaspora Ewropayê jî wek grûbekê di vê komîsyonê da cîh bigrin.

Konsûsek kurdan li daxwazên ji YE divê pêk bê. Daxwazên kurdan jî alîyê muzakereyan bên tespît û naskirin.

Medya û raya gîştîya kurd divê babeta YE û Tirkiyê herdem di rojevê da bigrin û helwesta xwe eşkere bikin.

Sazgeh, sîyasetmedar û zanyarên kurd li Ewropayê divê giranîya xwe bidin vê babetê jî û tesîrek li ser partî û hikûmetên dewletên YE bikin.

Hikûmeta Herêma Federal ya Kurdistanê divê alîkarîya kurdên bakûr û daxwazan li YE bike.

Bi daxwaza serkeftina xebatên me, sipasî we hemûyan dikim ku we gotara min guhdar kir.

Her wiha, ji dil sipasî hemû hevalên amadekar yên konferansê dikim.

Bimînîn di xweşîyê da.

www.arsivakurd.org

Gotara ji bo Kombûna Kurdên Anatolîya Navîn
li Kopenhagê, 29ê Gulana 2010an

MÎRASA ÇANDA KURD

Etnolog Haci Akman

Bi awayekî sade wateya mîrasa çandî yekûna hemû metaryal, imetaryal û hebûnên çandê ye. Mîrasa çandî bi awayekî rast tespîtkirin, rêkûpekkirin, nirxandin û karanîna hemû dab, nêrît û normên çandekê an jî komekê ne. Têgînên çanda xwe naskirin, ragihîn, nasname û têgihiştin tevde bi hev ve û bi mîrasa çandî ve girêdayî ne. Yek bê yên din nabe. Heger yek ji wan kêm be an jî nebe, yên din jî kêm dibin an jî nabin.

Ji ber ku kurd ne xweyî coxrafyayek dîyar in, heta niha li ser pirsên nasnama xwe, mîrasên xwe yên çandî û bi çi awayî parastina mîrasên xwe yên çandî bikin, nefikirîn e. Ji milê din ve jî nebûna kompetenseke profesyonel hiştiye ku ragihandin û parastina van xalan zehmet bibe. Îro kurd bi rêya avakirinên siyasî û çandî ve di derbarê naskirina nasnama xwe de seferber bûne. Lê belê ji ber ev komel û rêxistinên hatine sazkirin bi îdeolojiyek diyar ve girêdayî ne, ew nikarin mîrasa çandî ya kurd bi her awayî û ji hemû milan ve biparêzin û ragihîn in. Ji ber ku çand bi xwe xweyî hin taybetmendiyan e bi hîn çarçoveyên bîrdoziyî ve bi şêweyekî têkûz nayê naskirin, parastin û ragihandin.

Mîrasa çandî ya kurd, kokên xwe ji Mezopotamyaya li cîhanê çanda herî kevin e digire. Lê bi demsalan e ev mîrasa çandî ya kurd rastê zordarî, êriş, şerên navxweyî, biyanîkirin, nepejirandin û bişaftineke bibandor hatiye. Gelekî ji mîrasa çandî ya kurd ya xweru wenda bûye, tûnebûye an jî bi şêweyekî din hatine rûxandin. Iro gelek mînakên bêhejmar henin ku ew bîrên çandî yên bi qiymet bi tu şêweyî cihên wan nayên dagirtin, ji aliyên biryarên siyasî yên çar dewletên ku Kurdistan dagirkirine (Iran, Irak, Suriye û Tirkiye) ve tên wendakirin û tûnekirin.

Îro hisgiriya kurdan di derbarê dîroka kurd û çanda kurd de mezintir bûye. Ev hişyarbûn û hisgirîya civakî girîng e. Ji ber ku mîrasa çandî mezrekeke civakî ye. Kengê ev tiştên heyî di civakê de wekî daringên çandî werin pejirandin, parastin, berdewamkirin û ragihandin, wê demê ew ê bibin beşekî ji mîrasa çandî.

Kurdistan ji aliyê çar dewletan ve dabeş bûye. Her wiha gelê kurd jî çar

www.arsivakurdi.org

parçe bûye. Rêxistina civakî zêdetir bi dabeşîna cografî ve girêdayî ye. Gelek netew xweyî çarçoveyeke cografî ne û gelekî mirov xwe bi netewekî di qadeke bi sînor an jî heremeke diyar ve nas dikin. Li warên ku netew, bi ax ve bi vê şêweyî negiredayî bin ji bo wê netewî barek alozî peyda dibin. Wateya netew **hîsên-em** û peyîtandina nasnameyê ye û pê re jî bi qadeke cografîk ve girêdan e.

Dabeşbûna gel, nebûna qadeke cografîk ya bi qanûn û wateya diyalogên di derbarê pirsgirêkên çandî pê re jî neberdawamî û neparastina mîrata çandî û birên çandî tevlîheviya vê mijarê diyar dike. Bi heman sedemî ji bo pirsgirêkên çand û mîrasa çandî berhevkirina kompetanseke pîşeyî gelek zehmet e. Di bin mercên marjînal ya bi vî awayî de, di derbarê çawa mîrasa çandî ya kurd bijî, berdewam bibe û pêş bikeve lêkolîn kêm in. Ji ber rewşa siyasî ya kurdan aloz e, mercên çand û danûstandina zanebûna çandî jî ne baş e.

Îro ji bo lêkolînvan û entellektuelên kurd projeya nasnamê girîng e. Li cihê ku hêz û qiwetên xwe ji bo kesên din bi kar bînin, li ser projeya nasnamê lêhûrbûn û bi xwe cewaziyên çanda xwe, dîroka xwe û mîrata çandî ya xwe serxwetbûn jiyani ye. Di vê xalê de mîrasa çandî ya kurd û nasnama netewi ya gel ji têkoşînên demdirêj yên çar



Bergê Şerefnameya bi îngilîzî.

parçê Kurdistanê cûda nayên nirxandin. Mirov dikare bibêje ku pêşketin û paşketina çanda kurdî bi serkeftin û binketina têkoşînên azadiya kurdan ve têkildar e. Ji milê din ve mîrasa çandî ya kurd ji têkiliyên polîtik bandor girtiye. Ev têkilî ji mîrasa çandê, siyasî û nasnamê dîroka gel ava dike.

Di derbarê têkberên kurd de kêmzanebûn hemû tiştên heyî di bin kategoriyeke rast de sîstematîkkirinê û katalogkirinê zehmet dike. Lê belê wate û ragihandina van tişt û têkberan gelek girîng e. Ev tişt piştî aîdiyeteke netewî û heremî an jî bi parzemînekî an bi baweriyekî ve girêdan dikarin kata-

www.arsivakurd.org

gorîse bibin.

Kevnargeha Brîtanyayê, nasnamên netewên bêwelat û yên diyasporayê di bin referansên cografî yên din de kategorîse kiriye. Weke mînak tişt û berhemên kurdî di bin navê Iran, Irak, Turkiyê û Suriyê de an jî hin zêdetir bi giştî weke tişt û berhemên ji Mezopotamyayê hatine kategorîsekirin.

Weke mînak Şerefnameya ji aliyê Prince Şarafkhani Badliş 1543-1603 hatiye nivîsîn û li ser jiyana eşirên kurdan weke çavdêriyek e bi çar kopîyên xwe ve û gelek dokumenterên nivîskî û pirtûk di bin navê Dr. Muhammed Isa Waley, berhevokên fars û tirk tê pêşandan. (***Dr. Muhammed Isa Waley, Britiş Library and Serefname 1597 – Britiş Library)***.



Tawisê Melek ku sembola gelê kurdên ezîdî ye, di kevnargeha Birîtaniyayê de bi şêweya di îslamîyetê de sembola delalbûnê tê danasîn. Her wiha mirov li van kevnargehan rastî gelek berhem û tiştên kurdî, cil û berg û pêlavên kurdî, zêr û ziber, ber û xalîyên kurdan tê ku hemû nîşanek, sembol û hunera kurdî ne. Lê belê ne bi navê kurdan. Ev tişt û berhemên girîng yên kurdan ewqas hatiye dabeşkirin ku li hemû deveran mirov rastê van rumetên çandî tê. Mînak li kevnargeha Stavenger ya Norvecê hin pareyên kurdî bi navê "***di demsala Vîkînga de pareyên Kurdî"*** tê pêşandan.



Hin wêneyên van pareyan di bin navê "***Norsk Kurdisk Virtuelt Museum"*** hat pêşandan.

Weke agahdarî li jêr navên kevnargehên li Birîtanyayê ku dikarin li wir tişt û berhemên kurdan bibînin heye.

Kevnargeha (muze) Pitt Rivers. Belgewarkirin (dokumentasyon), tekstîl û materyal.

Kevnargeha Horniman (England)

www.kurdishkurdi.org

Belgewarkirin (dokumentasyon) tekstîl û materyal.

Kevnargeha Brighton (England) Belgewarkirin (dokumentasyon), tekstîl û materyal.

Kevnargeha Zanîngeha Cambridge (England) Belgewarkirin (dokumentasyon), tekstîl û materyal.

Kevnargeha Royal Geographical Society (England)-wêne.

Kevnargehên Victoria and Albert Museum (England)-wêne.

Kevnargeha li Londonê. (England)-wêne.

Ev rewşa parçebûyîna berhem û tiştên çanda kurdan encamên rewşa rastiya kurdan e. Kurd di şeş xalên girîng de dabeş bûye.

Dabeşbûna erdnîgarî
Dabeşbûna dîrokî
Çand
Folklor
Ol
Ziman

Di vê xalê de dixwazim hin têgînên girîng di derbarê çandê de rave bikim.

Bêxwendawariya çandî: Tê zanîn ku bêxwendewarî bi karanîna zimanê ve girêdayî ye. Bêxwendewarî nebûna nivîsîn û xwendinê ye. Berevajkî em dikarin bêjin, gel dikare bixwîne û binivîse ji bilî ku tiştekî bibêje û têbigihîje. Bexwendawariya çandî, baş netêgihiştina wêneyan, têgînan, rumet û xeyalên e. Di vê mijarê de ol, diyalektika heremî û aloziyên bîrdoziya di navbera partiyan de rolekî mekanîzmaya daneseknandinê lîstiye.

Her wiha ev dibin sedema ku xwestekên şexsî li pêş fikrandina netewî be. Weke mînak nakokiyên di nav bera Soranî-Behdînî, kurden bakur, başur, rojava û rojhilat de.

Kerbûna çandî: Baş têgihiştina dengan e. Dengedengî dikare têgihiştin û axaftinê zehmet bike û em bi guman bibin ku kîjan dengê zimanê dibîsin. Kerbûna çandî, baş nebîhistina axaftinan e. Di bin dengedengîyê de mirov ji bo ku baş bibîhîse xwe konsantire dike. Heger mirov ji axaftinê re amade be wê demê dengê mirov ê baştir û hêsantir were bihîstin û fêmkirin. Bi ciddî wendakirina hisên bîhîstinê dibe sedema hin encamên civakî.

Korbûna çandî: Li cîhanê ne bi çavên xwe bi çavên kesên din nêrîn e. Weke mînak gelên hatibin bişaftin bi bandora bişaftinê ve di nêrîn û dîtinên xwe de ne aîdê xwe ne.

Niha pirsê herî girîng li pêşiya me ye. Dezavantajên heyî bi çi awayî werin beralîkirin? Ji bo vê divê rewşa heyî baş were fêmkirin. Ji ber ku Kurdistan di navbera çar dewletan de hatiye parvekirin, nasnama kurd jî nasnameyek

www.arsivakurdi.org

bêdewlet e, dabeş e û aloz e. Ne xweyî enstituyên xwe ye. Ji hişên civakî weke kevnargeh, pirtûkxane û arşîv bêpar maye. Kevneşopên xwe yên daringî û arişî ku ji nasnameya etnîkî ya kurd re referansa dîrokî ye, rêkûpek nekiriye. Bi giştî û total nafikir e. Heger ev xal baş werin fêmkirin wê demê deriyê çareseriyê jî ê dest bi vebûnê bike. Lê kurd di derbarê bêstatûbûyîn, stratejiyên nû û seferberî, saziyên çandî û polîtîk, abîde, sembol, al, dîmen, materyal, xwarin, cil û berg, qehraman, nav û manîfestasyonên gelemperî de xweyî ezmûn in. Ji aliyê din ve organîzasyonên kurdan li ser mijara şerê siyasi ya ji bo azadiya Kurdistanê, bi zimanê zikmakî axaftin, parastin û ragihandina nasnameya xwe ya çandî xweyî lêhurbûnê ne. Aktîvîzma siyasî, nasnamê ji rewşa rastiya kurdan ya bêkontrol û aloz diparêze. Ev organîzasyonên heyî temsîla pêşketina nettverka cîvaka kurdan e. Weke mînak Kurdiş Cultural Centre li Londonê sala 1985 li Lambeth, zêdetir endamên xwe ji Kurdistana başur in. Demeke dirêj ji bo kurdên hemû parçêyên Kurdistanê bû sîwanok. Navenda herî mezin îro li bakurê Londonê Haringeyê Komaleya Karkerên Kurdistanê ye (The Kurdiş Worker Association) û derûdorê 4000 endamê xwe heye. Kurdiş Community Centre jî derûdorê 4500 endamê xwe heye û gelek ji wan kurd in.

Karanîna çavkaniyên heyî jî di çareseriyê de xweyî rolekî bingehîn e. ***Çavkaniyên devkî*** ya kurdan xezîneyek e. Di wêjeya gel de gelek vebêjên li ser evîndarî, şer, nêçîrî, jiyana rojane, nakokiyên di navbera eşîran û şerên li dijî dagirkeran heye. Her wiha têkoşîn, jan û hêvî di mûsik, dans, wêje û hunerê de hatiye bikaranîn û bi şêweyekî nasnama kurdî hatiye parastin û ragihandin. Dema ku nasname ji rastiya xwe dûrket wê demê nasname nefamber dibe. Ji ber ku nasname bi rojane di vê bi biyografiya civak û şexsî re bi paşeroj, îro û pêşerojê ve girêdayî be. Vebêjên devkî û forklor bi salan e bi nexşên nasnama çanda kurd bûye xweyî wateyeke navendî. Lê belê ev vebêjên giranbiha mercên werin nivîsandin û bibin vebêjên nivîsîne bi dest nexist in.

Rewşa zimanê di pêşketina çandî û wêjeyî de bûye astengeke girîng. Gelê kurd xweyî kevneşopiya wêjeyîya dewlemend e. Ev formên dewlemend ya hunera vebêjiyê, bi rêya vegotinên epîk, mît û çîrokan re dîrok û paşerojê çîn bi çîn gihandiye îro û ev jî li dijî jibirbûn û tunebûnê têkoşîneke girîng e.

Di vê xalê de girîng e çend gotin li ser ***dabeşbûna gelê kurd*** were gotin. Dabeşbûna kurdan ne bi destên xwe bûye, ew hatine dabeşkirin. Kurdan ev

www.arsivakurdi.org

dabeşbûn qebûl kirine û di nav xwe de jî berfireh kirine. Şerên birakujî û neqebûlkirina hev nîşaneyên dabeşbûna navxweyî ye.

Bi perspektîveke nû ya îro, ji bilî etnîkî di tiştên din de cewaziyên hevdu qebûlkirin girîng e. Ji bo vê di vê hin sembol û element weke sembol û elementên netewa kurd ji aliyê hemû kurdan ve werin bikaranîn û bibin rûmetên hevpar ya etnîkî. Her wiha cewaziyên heyî jî ne weke sedemên parçebûnê, bi perspektifeke demokratîk divê weke dewlemendî werin qebûlkirin. Ji ber ku her kesek ji hev cuda ye qebûlkirina van cewaziyan wê bibe hêz û rêz, neqebûlkirin jî wê bibe bêhêzî, alozî û parçebûnî.

Heger her kurdek hîsên di şexsê xwe de pêş bixe, wê demê gelê kurd wê bikaribe gavên girîng di derbarê nasnamê de bavêje. Îro kurd li hemû cîhanê belav bûne û kurd dikarin vê rewşa diasporayê weke mercên pozîtîf bi kar bînin. Diaspora dikare bibe weke qezencek. Ji bin çesp û polîtîkayên bişaftina çar dewletên mîna Iran, Irak, Suriye û Tirkiyê derkeve, dikare bibe weke henaseyek. Her wiha mirov dikare bi hêsanî ji merc û teknolojiyên diasporayê sud werbigire. Kesayetiyeke polîtik û xweyî li prodoksiyonên xwe yên çandî derketin, dikare xwe bi pêş bixe. Îro generasyona nû ya kurd zêdetir pirsên 'ez kî me' û 'niha bi kuderê ve diçim' li xwe dike. Ji bona wan, peyva '***welat***' weke bihuşta wenda ye. Kurd ji her demî zedetir xweyî derfetên xwe organîsekirina xwe, xweyî li rumet û berhemên xwe yên çandî derketin û mercên nasnama xwe avakirinê ye. Divê em têgînên ku bingeh û nîşaneyên nasnamê, cografya, çand û hebûnê ne, baş û rast fêm bikin û xweyî kirde û ked bin.

www.arsivakurdi.org

Gotara ji bo kombûna kurdên Anatolîya Navîn
li Kopenhagê, 29ê Gulana 2010an

Perwerdeya bi zimanê dê

Ali Ciftci

Mêvanên bi rûmet û hevalên hêja!
Berî ku ez li ser perwerdeya bi zimanê dê deng bikim, dixwazim bi çend gotinan girîngiya kovara Bîrnebûnê û zimanê nivîsê bêjim.

13 sal in kovara Bîrnebûn tê weşandin. 45 hejmar heta niha derketine. Bîrnebûnê cîh daye hemû zaravayên ku li Anatoliyê tên deng kirin. Di wan hejmaran de ji çirok, metelok, hekat, kurteçîrok, yaranî û ji zargotina kurdên me nivîs û lêkolîn hatine berhevkirin û bi kurtî, ji folklora me qasî ku ansîklopediyekê dagirê materiyal hatiye berhevkirin. Ew ji mîrasa kultura me ra bûye çavkaniyek. Divê ev çavkanî hîn jî bêt dagirtin, parastin û pêşxistin.

Bi wê re girêdayî ez ê li ser çend nokteyên girîng ên zimanê nivîskî bisekinim;

Ji ber ku me bi zimanê xwe perwerde nekiriye piraniya me tenê bi zimanê devkî dizanin û ji ber wê yekê jî zimanê me yê niviskî pêş neketiye. Zimanê me yê devkî jî li gor hewcedariya rojane ne hewqes berfireh û dewlemend e. Dema ziman, rojane di her warê civatê de neyê bikaranîn pêş nakeve, berfireh û dewlementir nabe. Herêmî dimîne.

Zimanê niviskî dewlementir e ji ber ku bi rêk û pêk û sîstematîk e. Yanî li gor rastnivîsîna zimanî tê nivisîn, îmkana serrastkirin û xwe ji nû ve formule kirinê heye, îmkana ku bi rêya ferhenga xezineya gotinan were dagirtin û li gor demê xwe nû dike heye û bi vê re ziman her pêş dikeve û tê parastin.

Ji ber rewşa aborî û sîyasî li welatê me asîmîlasyoneka pir xort berdewam e.

"Rêya asîmîlesyonê ya yerî bi hêz sîstema dibistanê ye. Yanê perwerdeya bi zimanekî din e. Piştre radyo, televizyon, sîstema dîn(ol), çapemenî, civak, rewşa jiyana rojane û gelek dem û dezgehên din tên. Perwerdeya dibistanê bi program û sîstemeke berdewamî tê meşandin. Ji zarokxanê heta lîseyê dewam dike. Zarok berî ku dest bi dibistanê bikin yek gotin bi zimanê tirkî nizanin lê zimanê xwe yê devkî baş dizanin. Piştî perwerdeya çend salan beşek ji wan êdî nikarin xwe bi zimanê xwe îfade bikin û bi zimanê dibistanê an jî perwerdeyê deng dikin. Dema dest bi dibistanê dikin bi tirki gotinekê jî nizanin, lê dema dibistanê diqedînin, vê carê zimanê xwe nizanin. Êdî bi tirkî dipeyivin, bi tirkî dinivîsin". [1]

Mêvanên birêz, heval û nasên hêja, ew politîka asîmîlasyonê ya li welêt têr nekiriye, heta li welatên Ewropa jî bi eynê sîstemê her berdewam e. Bala xwe

www.arsivakurdi.org

bidinê, li hemû welatên Ewropayê ku tirk jî wek me koçber in, di her qada jîyanê de bi rêya îmkanên dewlet û rêxistinên xwe yên olî ketine naw însanên me û li wan welatan jî wê politîkaya xwe ya nîjatperestî û asîmîlekirina zarokên me didomînin. Divê em wek dê û bav pir hişyar bin di vê meselê de. Bi ya min em kurd hinek berpirsiyariyên xwe yên dê û bavtiyê nikarin bi cîh bînin!

Berpirsiyariyên bingehîn ên dê û bavan, xwarin û vexwarin, cil û berg û ciyê ku zarok lê mezin dibe bi emniyet be. Herwiha divê perwerdeya bingehîn jî di rewşeka aramî de bi zimanê dêya xwe perwerda xwe bibîne. Ê me di vê noqteyê de em nikarin vê perpirsiyariya xwe bi cih bînin. Sebeb ci dibin bila bibin ew berpirsiyari ya dê û bavan e û dûre jî yê perpirsên civatê ye. Ew jî îro di destê yekem de yê beledîyan, îl meclisî û herwiha yê dewletê ye. Yanê divê siftê vê heqê dê û bav ji dewletê wek hemwelatiyekî daxwez bikin.

Zarok hîn di zikê dêya xwe de ye dengê dêya xwe dibîhise. Zimanê dêya xwe bi melodiya wê, rîtma wê ya taybetî, hêz, lêkdan û dengê ziman hîs dike, dibihîse. Ev dibe zimanê zarok yê yekem, zimanê dê. Zarok heta heft saliya xwe bi zimanê dê hîn dibe û dizane. Dema ew dest bi dibistana seretayî dike, heger perwerde û hîndekarî ne bi zimanê dêya şagird be, ew zimanê ku heta heft salan hîn bûye dimire. Zarok dest bi zimanek din dike ku fêm nake. Dema zarokek tê dema dibistanê an 6-7 salî ye, ew 8 000 -10 000 gotinan dizane.[2] Dema dibistan bi zimanek din be, wê demê 8 000 -10 000 gotinên ku ew dizane bi carekê de ji mêjiyê wî/wê tên paqijkirin û hejmara gotinan dibe sifir. Bi ser re jî dikeve rewşeke ne baş a psîkolojîk. Ew bi carekê de ziman û nasnameya xwe wenda dike.

Berpirsê vê gunehkariyê herçiqas dewlet be jî para dê û bavan jî heye!

Ji bo ku hinekî din girîngiya ziman bê zanîn ka em binêrin zimanzan pispor li ser ziman û fonksîyonên wê çi dibên?

"Dîtinek heye ku dibê ziman xwedî yek fonksîyonê ye, ji bo danûstendinê ye. Yanê aletekî komunîkasyonê ye. Erê ev yek ji foksîyonên ziman e, lê hemû ne ev e. Ev dîtineke ne zanyarî ye û dîtina Jakobistên fransî û Stalîn e ku xwestine li ser navê şoreşgeriyê netewe û gelên bindest asîmîle bikin. Kemalîzm jî kopîya wan e. Hîn îro jî kes û dewletên nîjadperest vê dîtinê diparêzin an jî demagojiya vê dîtina Jakobîstan û Stalîn dikin. Lêbelê li hember vê dîtina nîjadperest îro hemû zanyarên ziman û zimanzan dibêjin ku ziman bi fonksîyona xwe ya têgehiştandinê re, taybetiyên, etnîkî, çandî, nasnameyî, sîyasî, dîn heta çînî di nav xwe de diparêze. Ya herî girîng ziman desthilatdariyê bi xwe re tîne. Bi giştî çar fonksîyonên ziman hene.

Têkilî (ragihandin-komunîkasyon): komunîkasyon jî dualî ye. Yek jê têgehiştandin û ya din jî xwe îfadekirin e. Mirov bi wesîteya ziman bi hev re têkiliyê datîne. Ferqa di navbera mirov û ajelan de jî yek jê ev e.

Raman: Herweha mirov ziman ji bo raman, xeyal, zanîn û zanyariyê bi kar tîne. Zarokên biçûk têgehên hêsan û tiştên

www.arsivakurd.org

ku nas dikin fêr dibin. Wek kevçî, nan... Dema zarokek peşî dengê kevçî bibihîse, êdî dizane kîjan kevçî ye û kîjan jî ne nan e. Her ku zarok mezin dibe, êdî têgehên neberbiçav (abstrak) fêr dibe, wek malbat, dibistan, polîtîk... Berî ku zarok dest bi dibistanê bikin êdî xwedî gelek têgehan in. Ev ji wan re dibe alîkar ku li dibistanê di perwerde û hîndekariyê de bi kar bînin li wan zêde bikin. Em bi ziman diaxivin, mijaran plan û pêşkêş dikin. Û em bi kesên din re gengeşî û gotûbêj dikin û dixwazin pirsgirêkan çareser bikin. Raman û têkilî girîft in. "Mirov nizane gelo dema difikire alikariya ziman çiqas dibe. Pileya girêdana komunîkasyonê û têgehan çawa ne û çiqas in. Em carnan difikirin dema mirov bi zimanekî baş bizanibe, wê demê dikare baş bifikire jî. Ma ev rast e? Hinek kes hene ku bi zimanekî an jî bi çend zimanan baş dizanin, lê dema dipeyivin tiştek ji wan fêm nabe. Gelo sedemê fonksîyona raman û kombînezekirinê ye? ..." (**Cumminngs**)

Hîsên nasnametî û serxwebûna komî: Dema mirov bi zimanekî din dipeyive di aksanê de diyar dibe ku mirov biyanî ye. Mirov kî ye, ji ku ye, ji kîjan komî ye. Ev jî mirov ji komên din cihê dike. Ji derî aksanê di hevoksaziyê de jî diyar dibe, xwe dide der û dest ku mirov xerîbê wî zimanî ye. Helbet îstîsna hene. Hinek kes hene ku dikarin wek an jî nêzîkî zimanê ku hîn bûye bipeyive. Lêbelê piranî û giraniya kesên bîyaniyên wî zimanî diyar dibin ku xerîb in. Kesên ku weha bi aksana xerîb dipeyivin xwe biyanî hîs dikin û yên wî welatî jî têderdixin ku xerîb e û pişt-re zimanê wan hîn bûye. Fonksîyona nasnameyî beşek jî çandê ye. Hem jî beşeke mezin û girîng e.

Danûstandina çandî: Ziman rasterast bi çandê ve girêdayî ye an jî çand raste rast bi ziman ve girêdayî ye. Her zimanek di warekî jiyanê an jî xebatê ve girêdayî ye. Xelkên ku çandiniyê dikin di nav çandiniyê de ne, bi hezaran gotinên çandiniyê dizanin û di vî warî de zimanê wan dewlemend e. Koçerên ku heywanan xwedî dikin di warê heywan xwedîkirin û berhemên wan de zimanê wan dewlemend e. Yên ku di warê teknîk de bi pêş ketine xezîneya wan a gotinên teknîkî gelek in. Heta li gor cih û war jî rewş tê guhertin. Li herêmên çiyê zêde navên dar û ber, mêwe û heşînahiyan hene, li herêmên deşt û naverast zêde gotin û têgînên çandiniyê hene. [3]

Bingehê demokrasî û azadiya ku di serdema me de heye li ser van sê xalên girîng ên jêrîn ava bûye û bi berfirehî xurt dibe:

1. pirçandî, pirzimanî, pirolî û pir rengî.
2. ji bo aborî û bazara cîhanê tu tixûb û astengan naxwaze. Aborî û bazarê êdî tixûb çirandine.
3. nasyonalîzmeke teng, girtî rê li ber globîzma aborî, ramanî û civakî digre.

Tirkiye, Îran û Suriye bi komkujî, koçberkirin û qedexekirinan dixwazin ziman û çanda kurdî qedexe bikin. Kurdan bihelînin û biqedînin. Di vî warî de duruşmeya tirkan a "***ya hez bike ya terk bike***" polîtîka dagîrkerî û

www.arsivakurdi.org

nîjadperestiyê xwe awayekî vekirî dide dest. Ev duruşme pir vekirî, zelal û baş hatiye formulekirin. Yanî ya tu tirk î ya jî tu tune yî. Tu tirkitiyê qebûl nakî berî ku tu nehatî kuştin bar bike û ji vî welatî here. Li gor wan qebulkirina nasnameya kurdan û perwerdeya bi zimanê kurdî Tirkiyê perçe dibe." [4]

Pêwîstiya perwerdeya bi zimanê zikmakî

"Ew kesê ku bi zimanê xwe hîndekariyê nebîne, di destpêkê de zehmetiyên mezin dibîne. Fêrbûn/ hîndekariya zanistî ku bi zimanekî ku meriv pê baş fêhm nake, dem û karê meriv du-sê car zêdetir dike!... Dema zarokek gotinekê bi zimanê dîya xwe dizane, dikare bi hêsanî wê gotinê bi zimanê nû fêr bibe." [5]

Zimanê dê an jî zimanê zikmakî perçeyek ji kesayetiya meriya ye. Ji ber ku girêdan û têkiliyeke xurt di navbera zimanê zikmakî, hest û helwesta meriya de heye. Di nav ziman de kesayetî, çand, karakter jî hene. Zarok gotinên ku fêr dibin bi piranî yên ku têkilî (pêwendî) û girêdana wan bi jîyana pratîk ve hene. Hemû termînolojî û gotin hem xwedî wateyek û hem jî naverokeke wan ên çandî hene. Meriv dikare wateya termînolojiyan wergerîne, lê nikare naveroka wan yên çandi wergerîne. Ji ber ku ew li ser telesî û tecrûbeyên salan hatine avakirin. Di her ziman û çandî de gotin, termînolojî û têgeh xwediyê wateyên xwe yên cuda û rengîn in. Di her zimanî de taybetiyên weha hene. Bi wergerê mirov nikare bi kûrahî û berfirehî wate û daxwazên wan wergerîne zimanekî din.

Nivîskar û zimanzanê Fînlandî Anttî Jalava dibêje "***Zimanê dayika min çermê min û zimanê din jî dişibe cilûbergên min. Mirov kengê bixwaze, dikare cilûbergên xwe biguhere û li gor dilê xwe cilûbergên nû li xwe bike. Lêbelê ne munkun e ku mirov bikaribe çermê xwe biguhere...***"

Di serdema me de her ku zanyarî bi pêş dikeve û demokrasî berfireh dibe, li her derê cîhanê perwerdeya zimanê dê xurt û geş dibe. Divê neyê jibîrkirin ku zarava jî zimanê dê ye.

Herweha UNESCO jî di reporeke xwe de weha dinivîse: *ji çend generasyon şûn ve nîvê zimanên ku niha hene dê wenda bibin. Loma rêxistina UNESCOyê vê carê jî roja 21ê sibatê kir* "**Roja Zimanê Dê**".

Yekîtiya Ewropayê jî her çiqas ji bo karê nav xwe be jî li ser ziman qanûn û prensîbên bingehîn danîye. Di qanûna bingehîn a Yekîtiya Ewropê de sê madeyên girîng hene:

1. **Ziman mafekî welatiyan e û li Ewropayê kevirê hîmê demokrasiyê ye.**
2. **Ziman pirseke wekheviyê ye, wekheviya nav gel û takekesan.**
3. **Ziman pirseke aştiyê ye ku ev aştî beşek ji prosesa yekîtiya Ewropayê ye...."**

(*Qanûna bingehîn a Y.E.* bend 21)

www.arsivakurdi.org

Li Swêdê sîstema hîndekariya zimanê dê

Piştî lêkolîn û encamên perwerdeya asîmîlekirinê, di piraniya raporan de hat diyarkirin ku ev di aliyê perwerdê de ne serkeftî bû. Bilakis ji bo fêrbûna zimanê serdest astengî derdixist pêş.

Bi biryara parlamentoyê ya 1975an de, fermî perwerdeya bi zimanê dayîkê hat qebûlkirin.

Bi vê polîtîka nû, xerib di gelek katên civakî de bûn xwedî mafên wek azadiya hilbijartinê, wekhevî, xwedî berpirsyarî û mafên demokratîk û kesayetî, wek hemwelatiyên Swêdê.

Heta sala 1997an ev reforma fermî bi navê hîndekariya zimanê malê hatibû qebûl kirin. 1997an de di şûna zimanê malê de, gotina zimanê dê wek fermî hat binavkirin. Sebeba vê jî ev bû ku bilêvkirina zimanê malê, ji bo kesayetiya zarok tu tiştek îfade nedikir. Ji ber wê ev guhertin kirin, perwerdeya zimanê dayîkê (modersmålsundervisning).

Ev reform li Swêdê, bi qanûnî dikeve berpirsiyariya hemû şaredariyan. Şaredarî ji bo belavkirina agahdariya vî mafî berpirs e. Ji bo peydakirina mamosta, kitêbên perwerdê û peydakirina hemû îmkanan berpirs e.

Di salên 1990î de dewletê karûbarê perwerdeyê dewrê şaredariyan kir, di heman demê de dibistanên taybetî jî hatin damezrandin. Dibistanên taybetî malê kes û şirtketan in. Dibistanên taybet bi peran in. Lê ev pere û mesref dê û bav nadin, xwediyê dibistanê plan û projeyên xwe amade dikin, pêşkêşî şaredariyan dikin û heger şaredarî erê bikin pere û hemû mesrefan ji şaredariyê digrin. Li gor butçeya xwe dibistanê bi rê ve dibin. Di van salên dawî de her ku diçe hejmara dibistanên taybet zêde dibin. Niha derdorên îslamî jî li Swêdê dibistanên xwe yên taybet vedikin.

Di destpêkê de ji bo deh zimanên mezin beş hatin vekirin. Di nav van deh grubên xerib de beşa zimanê kurdî jî hatibû vekirin. Beşa zimanê kurdî 1985 heta 1995an berdewam kir.

Hîndekariya zimanê kurdî li Swêdê jî bi vê prosesa li jor dest pê kir. Yanê bi mafên ku ji bo xeriban ji teref dewleta Swêdê ve hatibûn dayîn, kurdan jî jê feyde dîtin. Bi taybetî jî kurdên ji Bakur û Başûr hatibûn, bi aktîvî ev maf bi kar anîn.

1980î bi desthilatdariya eskeriya Tirkiyê ve piraniya kurdên politîk ên Bakûrê welêt derketibûn derveyî welêt. Piraniya wan hatibûn li Swêdê bi cîh û war bûbûn.

Ev kurdên polîtîk di destpêka 1980î de li Swêdê, di warê rêxistînî û hîndekariya zimanê kurdî de aktîv bûn. Bi dehan komelên sîyasî û çandî hatın damezrandin, dîsan bi dehan weşanxaneyên kurdî hatin avakirin.

Federesyona komelên kurdan hat damezrandin. Bi vê wesîleyê kurdên Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava û yên ji Anatoliya Navîn hatin ba hev. Bi hev re di karên polîtîk û çandi de kar kirin. Her bi zimanê kurdî bi hev re deng kirin. Ev hemû bû wesîleyek ku êdî kurd, li Swêdê bi kurdan re radibûn û rûdiniştin!...

Ev têkilbûn û hevkariyên hemwelatî bûn sebeb ku kurdên Swêdê bi her

www.arsivakurdi.org

awayî xwedî li kesayetî û zimanê xwe derketin. Bi rêxistînî bûn. Ew hemû bûn sebeb ku mafên hebûn karibûn bi rihetî, bi kar bînin. Êdî zimanê kurdî jî li Swêdê wek zimanên din bûbû xwedî statuyek û mafek ku karibû pê jiyana xwe bidomîne.

Bi sedan mamoste, tercûman û karmendên şaredariyan ku kurdî dizanîn bûn xwedî kar. Rojname û kovarên mehane, pirtûkên perwerdeyê û yên zarokan, bi taybetî jî ji destpêka 1980î heta 2000î bi awakî aktîv hatin weşandin. Ew hemû ji bo perwerdeya zimanê kurdî bûn alîkar û rê ji bo pêşxistin û parastina zimanê kurdi vekirin.

YE (EU) ji bo parastin û pêşxistina pirzimanî û pirçandî, di dawî de gelek program dan ber xwe. Parastin û pêşxistina pirçandî û pirzimanî yek ji prensipên welatên YE ye. Ji ber vê yekê jî li welatê Ewropayê di van salên dawî de gelek lêkolîn û rapor têne kirin.

Bi kurtî piraniya raporên ku hatine belavkirin, ji bo parastin û pêşxistina zimanê dayîkê, di van xalên jêr de hemfikirin in.

- **Zimanê pêşiyê ji bo kesayetiyê xwediyê roleke mezin e.**
- **Ji bo fêrbûna zimanê didu û sêsiyan bigeheke hêzdar datîne.**

Li gor van prensibên YE divê hersal di dibistanan de statîstîkên perwerdeya zimanê dê bên kirin.

Li Swêdê statîstîkên perwerdeya kurdî bi gişti bo sala 2004an weha ne:

"Ji pola yekê heta ya neha 9 046 zarokên kurd hene ku mafdar in, beşdarî perwerdeya kurdî bibin. Ji wan 5 745 beşdarî perwerdeya kurdî dibin. Ev ji %64 e. Hejmara zarokên pêşdibistanan, lîse û şagirdên ku beşdarî perwerdeya bi kurdî ango perwerdeya alîkariyê dibin, ne di nav vê hejmarê de ye."[6] Eger meriv wan jî bihesibîne, hejmara zarok û ciwanên kurd yên ku li Swêdê beşdarî perwerdeya kurdî dibin di ser heşt hezarî re ne.

Li Swêdê 143 665 şagirdên ku bi 157 ziman û zaraveyên cihê dipeyivin û mafê wan yê beşdarbûna zimanê zikmakî bibin, hene. Ji wan %54,77, yanê 78 699 beşdarî perwerdeya zimanê zikmakî dibin.

Îstatîstîkên perwerdeyê, *Dayreya Karûbarên Îstatîstîkan* (SCB), amade dike. Her sal di dawiya meha 10an de her mamoste bi awayê pirsînê, ji şagirdên xwe dipirse, ka li malê bi kîjan zimanî dipeyivin. Her dibistan li gor beyanên mamosteyan formên îstatîktîkan tijî dike û ji SCBê re dişîne.

Çavkanî:

[1] *Perwerdeya bi zimanê dayîkê û pirzimaniya fermî*, Amed Tîgrîs, Apec 2009

[2] *Tvåspråkighet hos barn i Sverige*. Lund: Studentlitteratur, Håkansson, G. 2003
Tvåspråkighet med förhinder? Hyltenstam, K. red, 1996

[3] *Perwerdeya bi zimanê dayîkê û pirzimaniya fermî*, Amed Tîgrîs, Apec 2009

[4] *Perwerdeya bi zimanê dayîkê û pirzimaniya fermî*, Amed Tîgrîs, Apec 2009

[5] Ladberg Gunilla 2000:156, 2000:181

[6] *Dayreya îstatîstîkan ya navendî ya Swêdê* (SCB)

www.arsivakurd.org

Gotara ji bo kombûna kurdên Anatolîya Navîn
li Kopenhagê, 29ê Gulana 2010an

YEREL YÖNETIMLER

Bilal İnekçi

Ben konumum geregi özellikle yerel yönetim biçimi üzerinde durmak istiyorum...

Yerel yönetimler, Avrupa'da feodalizmin tasfiye edildiği dönemlerde ortaya çıkan kurumlardır. Yerel yönetimdeki en üst idari organ Meclistir. Mecliste her poltik grubun gücü oranında yönetime etki etmesi söz konusu olur. Yerel yönetimler Yasasına göre her türlü yerel ilişki, yerel meclis tarafından düzenlenir. Yerel meclis yerel otoritenin organizasyon yapısını da belirler.

Batı toplumlarındaki sanayileşme ve kentleşmenin gelişmesine paralel olarak yerel yönetimlerin demokratik niteliği sürekli olarak gelişmiştir.

Yerel yönetimler toplum bireylerine en yakın yönetim birimleridir. Toplum bireyleri bu birimlerde kendi yaşam koşullarını ilgilendiren kararlara etkin bir biçimde katılma olanağına sahip olurlar. Böylece kamu politikaları yerelde daha sağlıklı ve demokratik hale gelir. Belli alanlarda karar alma sorumluluğunun yerel yönetimlere bırakılması merkezdeki tıkanmayı ve bürokrasiyi de azaltır, yönetimin işleyişini hızlandırır ve hizmetleri yaygınlaştırır.

Danimarka yerel yönetimleri, Anayasanın 82. maddesinden kaynaklanır. 82. maddeye göre, Belediyeler, kendi işlerini ve ilişkilerini devletin belirtmiş olduğu statü çerçevesinde bağımsız olarak yerine getirir. Bu madde temel olarak, yerel otoritelere parlementonun uygun gördüğü bazı görev ve yetkilerin verildiğini ve bunun yanında devletin yerel yönetimler üzerinde gözetim yetkisinin olduğunu ifade etmektedir.

Yerel otoritelerle ilgili temel konu 31. mayıs 1968 tarihli Yerel yönetimler yasasıdır. Bu yasa; yerel otoritelerin yönetim organlarını, mali ve ekonomik esasları ve onlar üzerindeki devletin gözetiminin esaslarını düzenlemekterdir. Yine bu yasayla, yerel otoritelerin idari örgütlerini düzenleme esasları da belirtmekte ve bu konuda bu otoritelere oldukça geniş bir insiyatif sağlamaktadır.

www.arsivakurdi.org

Danimarkada yerel yönetim idaresinin genel kamu yönetimi içindeki payı 1970 yılından itibaren giderek artmaktadır. Yerel yönetimler ise merkezi idareden daha fazla politik etki ortamına açık bir alandır. Örneğin Danimarkada 20 bakan varken yerel organlardaki politikacı sayısı 5.000 kişiden oluşuyor.

Yine aynı şekilde yerel yönetimlerin yetki alanı kamu yönetimi içinde oldukça geniştir. 1970 yılında yapılan yerel yönetim reformuyla yerel yönetimlere büyük ölçüde bağımsızlık sağlanmışsa da Danimarka Anayasasına göre devletin yerel otoriteler üzerinde kontrolü vardır.

Devlet temel olarak il ve belediyelerin mevcut yasal zeminde hareket edip etmediklerini kontrol etmekte, ayrıca yerel ekonomilerin genel devlet ekonomisi paralelinde gelişip gelişmediğini de gözetim altında bulundurmaktadır.

Bu denetim çok sınırlı bir niteliğe sahiptir.

Yerel yönetimlerin idare hesaplarının uzmanlarca denetimi yasal bir zorunluluktur. Idarelerin çoğunda bu görev Mahali idare denetim birimi tarafından yerine getirilir. Bu birim Mahali idare birliği tarafından kurulan bir belediyeler arası kuruluştur.

Yerel yönetim ve demokrasi ilişkisi çerçevesinde, üzerinde durulması gereken önemli konu da sivil toplum örgütleridir. Sivil toplum örgütleri üyelerinin katılımına olanak veren demokratik merkezi yönetiminden özerk, kamu yararının tanımı konusunda merkezden ayrı görüşlere sahip kuruluşlardır.

Yerel yönetimlerin gelişim süreci ve sivil toplum ilişkisi arasında Türkiyedeki durum biraz farklıdır. Avrupada yerel yönetimler özellikle belediyeler, sivil toplum kurumu olarak gelişirken. Türkiyede yerel yönetimler, merkezi yönetimin ağır bir denetimi altında gelişimini sürdürmeye çalışmaktadır.

Avrupa Konseyi yerel kamu hizmetlerinin yerel yönetimlerce kanunların cizdiği çerçevede özgürce yerine getirilmesi hakkını yerel özerklik olarak ifade etmektedir.

Türkiye gibi üniter biçimde örgütlenmiş devletlerde, yerel yönetim birimlerinin siyasi özerliğinin olmast söz konusu olamaz. Çünkü siyasi anlamda özerklik demek, yerel yönetim birimlerinin kendileri ile ilgili konularda kanun çıkarabileceklerini ifade eder.

Yerel özerklik için yerel yönetimlerin serbestçe oluşturdukları veya seçtikleri organlar tarafından karar alma hakkına sahip olmalrı yeterli değildir. Yerel yönetimlerin aynı zamanda mali özerkliğe de sahip olmaları gerekir.

www.arsivakurdi.org

Gercek bir özerlikten bahsedebilmek için:

- yerel yönetim birimlerinin kesin karar alabilme yetkilerinin olması gerekir.
- ikincisi yerel yönetim birimlerinin organlarının bağımsızlığı ve seçimle iş başına gelmeleridir.
- ücüncüsü yerel yönetimlerin yeterli mali olanağa sahip olmaları gerekir.

Yerel özerklikle ilgili çalışmalarını sürdüren Avrupa Konseyi, üye ülkeleri bağlayıcı olmak üzere 20 yıla yakın bir süre özerklik yasası ve şartı üzerinde çalışmalar yapmıştır.

Özerklik şartı 21 kasım 1988 tarihinde Strasbourg da Türkiye tarafından imzalanmıştır. 8 mayıs 1991 tarihinde Avrupa Özerlik şartı TBMM tarafından 3723 sayılı yasa ile kabul edilmiş ama özerklik şartının bazı maddelerine çekinceler konulmuştur. Türkiyede yerel halkın yönetime katılımı konusunda yapılan araştırmalarda, halkın yönetime katılımı sadece zihinsel düzeyde kalmış uygulamaya bir türlü geçememiştir.

Ulusal ve insani hakları gasp edilen, kimlik ve özgürlük mücadelesi veren halklar için yerel seçimler önemlidir. Kürtlerin kendilerini siyasal ve kültürel kimlikleriyle ifade etmeleri hususunda yerel yönetimlerde yer almaları, ulusal sorunun çözümünü kolaylaştırır.

Bundan ötürü Kürdistan'da bir çok il ve ilçe belediyelerinin BDP'nin elinde bulunmasından Türkiye deki mevcut siyasi partiler, Genel Kurmay ve Kemalistler rahatsızdırlar. Ggeçmiş seçimlerde olduğu gibi hükümet, askeri ve idari bürokrasi Kürdistan'daki yerel yönetimleri BDP'ye kaptırmamak için yasal ve yasal olmayan her yola başvuracaktır.

Tirs û xofa ku wê rojê xist dilê Bilê, di jîyana wî de bû wek kulekê. Qet tu caran ji dilê wî derneket. Bûbû perçeyek ji ruhê wî. Li her derekê di bîra wî de bû, bi wî re mîna siyekê digerîya. Lê ya neçê, Bilê ew tirsa bi kesekî re parva nekir. Ji bo wê jî her ewran reş dadigirtin û baran dibarî, Bil direvîya mal. Hetanî ji dest va dihat, li rojên weng ji mal dûr nediket. Wê rojê, di mêjoyê wî de fobî çêkiribû.

Bilê li gundê xwe, dibistana destpêkê, dûva dibistana navîn û lîse jî li qezayê xwand. Zanîngah qezenc kir. Çû bajarekî mezin. Bi çend hembajariyên xwe ve, malek girtin û xwandina xwe berdevam kir. Lê ew tirsa birûsk û baranê qet ji serê xwe neavêt, an jî qeweta xwe negihiştê. Wê tirsê di mêjoyê wî de hêlînek xwe ava kiribû. Wek kuleke bêderman bi wî re digerîya.

Sibê Bil û hevalên wî ji xew rabûn. Çaya xwe dane ser agir, ji bo xuriniyê bikin. Xurîniya xwe kirin. Ji bo ku her kes here mekteba xwe. Hevalên wî bi dere ber derî ketin. Lê Bil ji hundur dernediket.

Bilê perdeya hodê kişandibû. Dîtibû ku baran dibare. Dilê wî kire girmegirm û xuhek sar bi ser junîyên wî de hatibû.

Elo li ber derî got:

– Bilo, de ware em bendewarê te ne.

Bilo:

– Na, bira ez xwe huro bêkêf dibînim. Hûn herin. Ez dixwazim huro bêhna xwe bigirim û vêsim.

Elo:

– Tu dizanî, bira em derdikevin. Em ê êvarê hevdu bibînin, got û derket çû.

Bil du sê saetan di mal de rûniştê. Paşê mêze kir baranê vekirîye. Bi der re der ket. Saetekê duduyan, li nav bajêr gerîya şuva, berve mal kete rê. Wexta nêzikî mal bû ji derva de li malê nêrî ku perdeyên malê girtine. Ji bo ku tava rojê bide hundir, perde Bilê bi xwe vekirîbû. Ew baş dizanî. Zanî ku tiştekî xerîb heye. Vegerî ser rêya ew pê de hatî. Pir neçû, rastî hevalekî xwe yî di sinifa wî de hat.

Erol:

– Bilo, tu huro nehatî fakultê. Xebera te, heye, li fakulta Mîmaran, çi bû ye?

Bil:

– Na, çi bû?

www.arsivakurdi.org

– Li wira forum çêbûye. Şagirdekî faşist hatiye kuştin.

– Erê, eleqa wê bûyarê û min çi ye?

– Eleqa xwe û te, dema hevalê te yî malê, Elo li kursîyê diaxife ew faşîsta, hatiye qurşînkirin.

– Na, lo?

– Tu bi gura min bikî, mere mal. Dibe ku polîs li Elo digere. Huro here maleke hevalên din.

– Gotina te rast e Erol. Perdeyên me berdayîne. Ji bo ku tava rojê bide hundir dema ji mal derketim, min bi destên xwe ew perdana vekirîbûn. Dibe ku Elo hate mal, tiştin girt û perde berdan, ji bo me bi nîşan be û çû. De ez herim pirtûkên bi min gerek ji mal bigirim herim, got û ji Erol veqetîya. Bil kete bînayê û enextara xwe di kilîda deriyê malê re kir. Ji paş wî ve yekî "Destên xwe, heyne jor û bide dîwar em polîs in." got. Bilê gotina wî kir.

Ji polîsan yekî destê xwe kire gepira Bilê û derî vekirin ketin malê. Sê polîs wûn.

Polîs:

– Navê te, çi ye?

– Bil e.

– Tu, Elo nas dikî?

– Erê, hevalê minî malê ye.

– Bêje, ka li ku ye?

– Çi dizanim li ku ye. Sibê rabû çû fakulteya xwe.

–Tu yê, bizanî. Çawa nizanî? Lê hûn di malekê de ne. Tu nizanî hevalê te yê here kêderê?

– Fakulteyên me, ne yek in. Her yek li perekî bajêr in.

– Me, nexapîne. Wî, merîyek kuşt.

– Na lo? Ez Elo nas dikim. Ez hevalê xwe baş nas dikim. Elo ne meriya, çûçika jî nakuje.

– Em, we baş nas dikin. Hûn giştik wek hev in. Tu bi dilê xwe yî. Hetanî em, Elo bi dest dixin tu mêvanê me yî. got.

Hetanî navbera dengkirina wan herdu polîsên din, serê malê anîn binê malê. Mala çar teleban xirab kirin. Lê qet tiştekî qedexe bi dest xwe nexistin.

Bil bi xwe re birin navendiya polîs, beşa terorê. Bilê dît 20–30 hevalên ku ew nas dike jî li wira ne. Sê rojan polîsan hetanî Elo bi dest xwe xistin bi wana îşkence kirin. Dema wana Elo bi dest xwe xistin, wek tiştekî şaşitî nekirine yên binçavkirî berdan.

Bil ji navendiya polîsan bi dere der ket, baran dibarî. Bil ji ber îşkencaya ku dîtî, bêhal û mecal ketibû. Sê didan şikestî, lêva jor dirîye, her derek bedana wî ji derbên copan mor bûbû. Bilo dema ji hundir hate derê şuva, heftekî li mal ma. Bêhna xwe girt û vêsîya. Dû vê dîsa dest bi mekteba xwe kir. Li fakultê ji hevalekî xwe re, cara yekemîn serpêhatiya zaroktîya xwe kat kir. Hevalê wî:

–Bilo, çima nabêjî: Barenek bû, sedema derba mêjoyê te. Yek jî, ya derba bedana te.

www.arsivakurdi.org

SERXWEŞÊ EVÎNÊ

bi saya baskên teyr û tilûran
ji nameyên te yên ji rondikan
ji dil û kezeba te yê peritî re
bersivê dişînim
di neynika asîmana reştarî de
qermîçokên qedera eşên eniyê te
dibînim
barê eşqa bareşa feleka xayîn
li ser pişta te siwar kirine
zencîr li devê heyveroniya
şadiyên şevên te xistine
zeviyên laşê te yên ziwa
ji tîna hesreta evînê hatiye
qewirandin
ji çavên kezeba pênûsa te
xerîbiya hêstirên sor
diherikin
tîr û taya tenetiya xopan
mizgîniya biharên te yên rengîn
dorpêç kirine
ji qirika kaniyên sîngê te
xwîna sosreta salên bêbext
diniqutin
kilîda rehbera peywendiya te
di kefa destê ewrên roja min de

www.arsivakurdi.org

veşartî ye
di riya sewdaseriyê de
mîna şewata agirê volkanan
tu dîn û har bûyî
li xelwetgeha asoyeke nenas
ketiyî nav eziyeta înziwayê
li çerxa şev û rojên çîlekêş
îbadeta xeyalên pêrgîhatina min dikî
di qalikê hestiyên miriyan de
tevna eşqa îlahî dirêsî
te
têra xwe para êş û nalînan
ji tûrikê sofiyên perestgehan
wergirtî ye
ez ji te re eşqê bêjim?
eşq
qêrîna êş û tirseke hovane ye
siya tofaneke çaxa mirarbûyî ye
bêrîkirineke li nav toz û dûmana ye
şemitandina lingên li ser berfa cemidî ye
jana kul û birîna xewnên perîşan e
eşq
valahiya gerdûna giyanê xepînok e
safbûn û masûmiya awirên melûl
ya dilê xoşewîstên bêmerhemet e
nefret û karesata arezûyên jiyana derewîn e

www.arsivakurdi.org

bêhna dûmanê cixareya lêvên hesretkêş e
eşq
mîna weşîna pelên zer
ya şaxên dareke hişkbûyî ye
li ser kezeba evîndaran birîneke
xençera tûj ya bêderman e
şahidê xemkêşiya demên nankor e
eşq
olana bêdengiya helbestvan û hozanên
xwe di nava axîna zîndanên xwe de
mehkûmkirin e
cankêşiya çûka hêlîn wêranbûyî ye
lingxwas û destvala gera li ser striyên jana dil e
di gewriya newalan de
poşmaniya hestên henasa fetisî ye
eşq ev e, tu têgihiştî serxweşê evînê?
ez ê
qêrîna helbestên te yên serpas
di paşila xwe de binixumînim
li ser erdhejiya tirba qedera te
tovên serxweşiya evînê bireşînim

Rindika te…

Xizan Şîlan
2009-10-28
Stockholm

www.arsivakurdi.org

daxwaze min ew e ku
xewnê ku min dîtî tu jî bibînî û xeyalên ku min ku kirî tu jî bikî

qismekî xewnan xwestek in
daxwaz in, xayel in û hevîn in
destên insên wiqasî ku em bawer dikinî ne yê direj in
û quwetê mêjo yê bes me têr dike
xeyal û daxwaz hene ku vegerine xwe ne mimkun e
min duh bi xewn dît
bihar bû
germ bi bostekê ketîbû nav axê
bûx berve ezman diherikî
meşên hingiv gul bi gul digerîn
min tu li ser kanîyê dîyî
avê zelal
tu xezal
rojê delal
dunê ne xema min bû
em li çaxê jîyanê evindarîyê dijîn
û germiyeke wek hingiv em hembez kiribûn
dilşad bûm çimkî tu yê li herdê min bûyî
em di ser pireke zirav re derbas bûn
çuçikên koçber ji helînên xwe re kirş û herî kom dikirin
me silav da çuçikan
û kenîyan

Seyfi Doğan

www.arsivakurdi.org

HAKHATA

min pişta xwe da zinarekî û bend pa
roj wek giliokekê agir ji kevîyê dunê da xuya kir
hecanêkê xwe li mejoyî min pêça û canê min germ kir
ez ji hev diçûm
bedengîyekê ez karr kirim
çavên min tişt nedîn
mîna perikekî sivik bûm
hundirê min teze
enerjîya min vegerî mal
bûm parçakî ji rojê
ax û ezman bû yek û heliye
kevîye dunê şewîti
hundirê rojê sipî
doralîyê xwe zer
çembere sisîye arreng
ar û petî bi dunê kat
ewr li nav okyanusa tirîjên rojê da
mina pêlên şewitî diherikîn
çuçikên koçber qor bi qor berve rojhilat difirin
dibûn yek kozî
di nav okyanusa tirîjên da ajni dikirin
û ji qenetên wanan da agirên heşîn dipekîn
herder ronahî
rengên zer, sor û heşîn dunê xemilandin
gulan yapragê xwe li ber tirîjên rojê vekirin
maren qerisi xwe xuskirin
helîn germ bûn
av herikîn
herkî roj hildihat rengê wê zer
tîrêjên wê germ
û dunê li ser min fireh dibû

www.arsivakurdi.org

zerduşt heta bîra min
dema ku tevlihevîyê
xwe wek ewrên reş
li ser civatê dagirt
wexte ku xwedan
bersivên xwe qedîya bûn
wexte ku eşîr
kom bi kom li cîya û banîyan belavbûyî bûn
dema ku keskîya mergan çilmisî
wexte ku libergerîyan û xelatan pere nedikirin
dema ku mehne jîyanê bûyî bû kêf û zewq
wexte ku edî jan bi îbadetan sivik nedibûn
dema ku tarî buyî bû kanîyan xerabîyê

wî ji jina xwe havovee xetirê xwe xwast
wek derwişekî devê xwe da çolê
û li navî çavê çîyayê sabalan konê xwe dagirt
şor da xwe ku heta ku ew îzahîyê nerindiye nebîne venegere mala xwe
roj, meh û sal derbas bûn
bi sabireke geheştî şev û bi ro raman kir
tî û birçî bû
sarmê û germê dest û lingen wî şewitandin
tu zahmetî ew ji lêgerîna wî poşman nekir
wi digot; a bibe
astengî; fikire xizanîyê û derewvana ye
wî dixwast dunê fehm bike
wî dixwast bersivên pirsên bêdawî keşf bike
kokî ku nerindîyê bi xwedî dike bibîne
insanan dilşad bike
û digot; insan layiqê jîyaneke qelew in
sibekê
ji şeveke sar, bi tirs û bi xof bi şunda
ji konê xwe derkat derve û berê xwe berve rojhelat kir
û agirekî xwe dada û keta nav ramanan

www.arsivakurdi.org

roj hedî û hedî ji ava dihat
rojê li ba kabîlê zerduşt tim bi rumet û qiymet bû
lê îro roj bi wî hing pirr pîrozwer dihat
mestbûneke qutsî di cane wî da kelî
peyamên muqaddes pêl û pêl hatin
dilî ezman xwe vekir
roj bû rêzan
herder ronahî
dunê refah
tirêjên rojê germ
zinarên sebalanê dost û heval
gogircûiyên cîyan sipî
ref bi ref dadiketin ser deştê
zerduşt fikiri;
"dunê ji şev û rojê
dunê ji tarî û ronahîyê
dunê ji rindîyê û xerebîyê
dunê ji aşa û derewvan
hatîyê pêkanîn"
zerduşt serê xwe berjor heyne
ezmanên dur şewq dan
ruhê dunê teze bû
zerduşt xwedêyê bi tenê ahura mazda li sema bi cîh û war kir bi şunda
xwedanê xerawîyê angra mainyu da hemberî wî
beriyê berve rojê kir
û bi hurmet got;
humata
hakhata
hvarşta.

Humata: Fikir baş bê fikirin
Hakhata: Şor baş bê gotin
Hvarsta: Kar baş bê kirin

Seyfi Doğan

www.arsivakurdi.org

NAR SOR NEBÛ

Mam Recall

Sala 1915an, navenda payîzê, rojek ji rojên şemîyê û şeva dawîyê bû. Ciranên Ermenî bar dikirin.

Li kêleka Behra Wanê, di hundirê hevşoki da du jinan û pitikekê, wek dersek mezin û watedar didabûn gelê Cihanê.

Wan rojan dewleta Osmanî hevwelatîyên xwe yên Ermenî ji Kurdistanê û ji Tirkiyê derdixistin û diajotin derveyî welat. Herdu jinan tevî şîna xwe, li ser jîyan û pêşeroja Narê jî radiwestîyan. Û tevhev wek mînak peymanek mirovatîyê jî mohr dikirin.

Marîa Xanimê, keçika xwe (Nar) radestî cirana xwe, Gula Îsmê kirîbû. Nar hîna sê salî bû. Li gora salên xwe piçek biçûk, behêz û jar xuya dikir.

Lê ew keçikek pir rûken û bedew bû. rengê çavên wê kesk, rengê porê wê jî wek ji hêla Xwedê da, her roj ji nû ve hatîbû hennekirin. Nêrînên wê ewqas tûj û watedar bûn ku dema mirov li çavên wê dinêrî hingê didît ku wek du gule tên barandin. Çend rojan bi şunda Xalê Heydo ji bo nêrînên Narê, bi jina xwe Gula Îsmê ra wiha digot:

"Lê Gulê! Bi Xwedê, nêrînên vê masumê, dilê min hûrik hûrik dike û dihelîne. Gelo mirov nizane ka çawa bibe heyran û xudanî vê berxê." Narê, ji dayik, bav û hevalên xwe, çendek peyvên bi kurdî jî fêr bûbû.

Wek: dayê, bavo, heval, av, nan, şekir û hwd.

Nar hîna di xewê da û li ser erdê bû. Marîa

Xanimê, ew di nav lihêfek sor û herîr da pêçandibû. Û hemî hebûn û sermîyana xwe jî kiribû hundirê têr û tûrekî û danî bû kêleka Narê. Nar kûr kûr dinalîya.

Wan rojên dawîyê, mîkrobek (hûrîn) pir giran û dijwar girtîbû. Ji ber wê sedemê, xîzexîzek ji singê wê dihat. Dilê Marîa Xanimê tevî wî dengî dibû wek rûnê di tewê da. Ji hêlekê da dihelîya û ji hêla din ve jî diqewirîya.

Gula Îsmê û Marîa wek du xwuşkan ketibûn himbêza hevdu. Wê gavê di

www.arsivakurdi.org

bin şehad û şewqa hîvê û hêstirkan da, şîna veqetandin û derçûyînê dikirin. Erê, ciranên Ermenî bar dikirin.

Êdî dawîya mermalî, ciranî û tevhevîya gelê kurd û gelê ermenîyan hatibû. Dîrokek dirêj û bi rûmet ji hêla dewleta Osmanî da, dihatibû bi dawîkirin.

Her çiqas piranîya kurdan, arîkarîya mermal û ciranên xwe kiribe jî, gelek kurdên bêar û bêşeref, wek îro çawa ji bo dewletên tirk, ecem û ereban birayên xwe difiroşin û dikujin, hingê jî, ji bo dewleta Osmanî, mermal û ciranên xwe difirot û dikuştin.

Marîa Xanimê perê kitana xwe ji ber devê xwe helîna û bi zimanê kurdî wiha digot:

"Gulê! Xwedê Narek dabû min. Û min sê salan ew wek çavên xwe parast û rind xirab anî vê rewşê. Xwişka min. Ew êdî NAR'a te û para te ye. Bila li cem te sorik û xweşik bibe înşallah. Wê wek keçikek kurdan mezin bike û wek prensesekê jî bike bûk. Û paşê jî, bi destên xwe radestî mîreki kurdan bike."

Marîa wek kanîyek miçiqî xuya dikir. Bi zimanî xwe, lêva xwe şil dikir û bi xazîya xwe ji wek ku qirika xwe av dida.

Ji nû ve perê kitanê danî ber devê xwe, bi deng û eşkere dest bi şîna xwe dikir û wiha digot:

Ezê Gulê ezê
Ezê bêbextê ezê
Ezê bêmal û bêwarê ezê
Ezê bêxudan
ezê bêmêr
ezê bêdar û bêNARê ezê

Ezê Gulê ezê
Ezê koçberê ezê
Ezê bêcan û bêhalê ezê
Ezê bêxanî
ezê bêgund
ezê bêciran û bêhevalê ezê

Û bi herdu mistên xwe, li singê xwe dixist. Dema ku dest dirêjî porê xwe kiribû, Gulê rahîşte zenda hevala xwe û ew rawestand. Û wek dayikekê, wiha şîret li Marîayê dikirin:

"Keçê dinik nebe! Û xwe neqerimîne. Tu diherî rêyek dûr û dirêj. Ji bîrneke! Keçikek te heye. Divê tu ji bona xatirê wê, li jîyanê qêm û saxlem bimîni û sax bijîyî."

Axaftina herdu hevalan, bidengê xasîya Marîayê, hatibû birandin Xasîyê, bi zimanê xwe, bangî Marîayê dikirîbû.

Erê, êdî wexta çûyînê hatibû...

Marîa Xanimê, carek din Gul himbêz kir û wiha digot:

www.arsivakurdi.org

”Gulê! Têm bextê te. Kincên Narê zû bi zû biguherîne. Ew ji mast û şorbê nîskan pir hez dike. Ez qurbana te, Gulê. Ji bîr neke! Mast û şorbe, şorbê ji nîskan û mastî bi şekir.

Ez xulamê te, Gulê! Heqê xwe jî helal bike. Xwedê herdem li cem te û li cem malbata te be û we biparêze înşallah.”

Û paşê bi awayeki bi xwe ewle, Nara xwe ji erdê helîna, bîhn kir, maç kir û wek xelatekê, radestî hevala xwe Gula Îsmê kir. Û berî veqetandinê jî, peyva xwe ya dawîyê wiha axivî:

”Gula Îsmê! Nar li te û li Xalê Heydo pîroz be!”

Û di heman demê da wek çûçikek şevê ji hevşo derket, firîya û wendabû û çû.

Çû!

Nar hîna di xewê da bû.

Hemî jîndaran, ew şev û roja di bin tirsek bixof û dijwar da û bêxew derbas dikirin. Bêdengîya xweza û mirovan wek tevî xemgînîya Behra Wanê jî dibû. Û bi wî awayî gelê Ermenîyan oxir dikirin.

Bavê Narê, (Garo) endamê partîyê azadîya gelê Ermenîyan (HINÇAK) bû. Berî çar mehan, li alîyê Geverê di şereki da hatibû kuştin.

Sêwîya çar mehan, carek din sêwî dima bû.

Nar aşiqê bavê xwe bû. Di wan çar mehên dawîyê da, bi nêrîn û pirsên xwe hundirê Marîayê diheland û dianî xwarê. Bi gelemperî ev pirsên li jêr jê dipirsî. ”Dayê! Bavê min çima nayê malê?

Çi bû, ji ber çi?"

Ez bîra bavê xwe dikim. Ez ji bavê xwe pir hez dikim, dayê. Xwezî carekê tenê were. Eger ew nikare were, bila em herin mala wî?

Min qet serê wî nediêşand ne wisa dayê?”

Û helbet tukesî qet nedizanî ka Marîa Xanim li hemberî Narê, di bin barî van pirsan da çi difikirî û çawa dijîya. Nara Kurdistanê hîna di xewê da bû.

Xalê Heydo û malbata xwe tiştên Narê ji tûrik û têrê derdixistin. Û bi awayeki bideng, yek bi yek dihêjmartin. Nav û hêjmarên tişt jî ji hêla Bekir da, li ser rûpelekê hatibû nivîsandin.

Listeya tiştan

Çar zêrên qremîs.
Taximek guhar.
Du gustîlk. (yên Marîa û Garo)
Tebaxek zîvînî.
Peykerek zîvînî.
Sed û bîst qayme. (yên Osmanî)
Xalîçeyek. (herîr)
Du perçe qumaş. (herîr)
Du balîfên vala. (kardest)
Sê kitan. (kardest)
Û kincên Narê

www.arsivakurdi.org

Xalê Heydo ji çaya xwe qurtek kişand û bi malbata xwe ra, wiha diaxivi:

"Ji xeynî kincan, her tişteki vê sêwîyê biveşêrînin û heta ku dayika wê vegere, baş biparêzin. Ew êdî keçika vê malê û namûsa me ye. Em çiqas li wê xudan biderkevin, dê Xwedê jî ewqas ji me razî û memnûn bibe."

Gula Îsmê bi çav û dilê xwe yî tijî, tiştê Narê berhev dikir. Paşê derbasî odeya xwe bû û demekê girîya. Tevî girîyê xwe, ji bo Marîa Xanimê gazin û gilî jî dikir û wiha digot:

"Ax serhişkê! Te hevaltîya me evqas erzan dizanî bû lê lê? Qey te lewma zêr û pere hiştin an ne? Yan jî, te hizir dikir ku em dê Narê birçî û tazî bihêlin? Keçê, tu bêpere çûyî lê lê? Wax wax wax! Li wan welatên bîyanî, tu ya çawa bêpere bijîyî, xwişka min? Wîşşş! Çi eybek mezin e lê lê. Ez kûr bibim. Min çima li çiqinê nenêrî? Wax, wax, wax!"

*

Ji mizgeftên der û doran, meleyan banga limêja sibehê dikirin.

Banga meleyan, di bin dengê çek û topan da diçû û dihat..

"As-salatû xayrûn mîne'n newm..

As-salatû xayrûn mîne'n newm."

Û bihna xwîna gelê grmenîyan jî, tevî wan dengan dibû û wek hundirê mirovan li hev dixist û dianî xwarê.

"Allah-u ekber...

Allah-u ekber..."

...

Wê gavê qîrîn û qîjeqîja zarokan û hawara jínan, wek hemî dîn û mirovatî şermezar dikirin.

Lê tu tişt nedihat guhêrîn.

"Laîlahê îllallah."

Gula Îsmê kincên Narê diguhêrandin... Xecika Heydo jî, ji xwişka xwe ya nû ra li ser argûn şîr germ dikir.

Narê, Gul û Xec baş nas dikir. Bi awayeki bêwate, li der û dorên xwe dinêrî û difikirî. Wek tu wate nedida hebûn û rewşa xwe ya wê gavê.

Lê qet nedigirîya...

Him şîrê xwe vedixwar, him jî bi nêrînên xwe yên watedar, ji Gulê û Xecikê, wek pirsên qet nên bersivdayîn dipirsî. Piştî demek kurt wek guherînek mezin li rûyên wê peydah dibû. Pir xenî û dilgeş xuya dikir...

Bi hal û rewşa xwe wek di heman demê da, bûbû keçikek bist salî. Û wek mînak her tiştek dizanî û êdî qebûl dikir. Û bi nêrînên xwe, wek ku wiha digot:

"Êdî Gul û Heydo dayik û bavê min, Şêxmûs, Sebo û Bekir birayên min, Şefîqe û Xecik jî xwişkên min in. Ez êdî keçika vê malê me. Meraq ne-

www.arsivakurdi.org

kin! Wele ez tu pirsan ji we napirsim. Û ji vira ha, tu serê we jî naêşînim."

Nar wek navê xwe sorik û wek şekirê Şamê jî xweşik xuya dikir.

*

Piştî gelek salan, Xaltîya Gul, (Gula Îsmê) wiha qala wan rojan dikir û digot:

"Çi bêjim ez qurban! Xwedê wan rojan, carek din bi tukesi nelimîne û dubare neke. Mala wan bişewite! Kûçikên Hemîdî (Hêzên Sultan Abdulhemîd) yên bêar û bênamûs, bûbûn wek gurên devbixwîn. Heval û mermalên me yên feqîr û bêguneh, talan û tarûmar kirin. Piranîya wan kûçikan jî, ji kurdên me yên bêmêjo û rûgemar pêk dihat. Ev dewrana, ji wan ra jî nemîne înşallah... Rûyê min, li ber lingên we be ez qurban! Bi hebûna Narê, min mêrê xwe Heydo î rehmetî, zarok, bûk û nevîya xwe, wek ji bîr kiribû. Her tişteki min, bi tenê Nar bû... Çi derewan bikim: Wek min ew anîbû dinê. Carinan xwe bi xwe ditirsiyam ku xudanê Narê rojekê vegerin werin û Nara min ji dest min bigirin. Min him dixwast Marîayê carek din bibînim, him jî min qet nedixwast Narê ji nû ve radestî Marîayê bikim...

Nara min, Nara min!

Ez qurbana te Nariiik Narik!

Pir bîra te dikim lê lê! "

Û digirîya...

Xaltîya Gul êdî jinek pîr bû. Ne çavên wê baş didît, ne jî guhên wê baş dibihîstin. Lê ya balkêş ew bû ku wek jinek ciwan, her bûyerên ku di paşerojê da hatîbû qewimîn, yek bi yek dianî bîra xwe û bi ciwan û ciranên xwe ra parve dikir.

Demekê qet deng nedida. Li kêlaka malê, li ser mitêlekê rûniştî bû. Wek zarokekê bi qirşeki biçûk bi xalîyê dilîst. Paşê keserek kûr kişand û wiha berdewamî axaftina xwe dikir:

"Nara min!. Ez pir bîra Nara xwe dikim. Înşallah di demek kurt da em dê hevdu bibînin. Êz hertim bi hêvîyek mezin li benda wê gavê me.

Mala minê!

Marîayê qet nedixwast Narê livira bihêle. Lê soz dabû Heydo î rehmetî. Em wek malbata xwe dihesibandin. Qey te digot, bûka vê malê ye. Pir bi rûmet bû pir! Çend roj berî derçûyînê, Heydo ji Marîayê ra wiha gotîbû:

"Marîa, keça min! Vê baş bizanibe ku tu wek Şefîqeya min, Nar jî wek nevîya min e. Helbet tu dayik destên zarokên xwe bernadin û nikarin ji wan veqetin. Lê rewşa Narê li ber çavên me hemîyan eyan e. Keça min! Were nebe sedema mirîna pitika xwe, ew nexweş e. Baş bifikire û tişteki çewt neke."

Marîayê, qet bersiv nedabû Heydo

www.arsivakurdi.org

Di heman rojê da danê êvarê bû. Marîa hat mala me û bi Heydo ra ev qise digotin:

“Xalê Heydo! Min biryara xwe da. Tu rast dibêjî. Bila Nar li li cem we bimîne.”

Pitşra sipasî me kir û tu rûnenişt, bi der ket û çû. Û ji ber wê hindê, Nar êdî bûbû keçik û xezala min. Wek navê xwe şêrîn û narîn bû. Lê ji ber malxiraba nexweşîyê, pir zû diwestîya.

*

Gula Îsmê jinek zîrek û zane bû. Bi xwarin û vexwarinên xwezayî, wek hingiv, hêk, mast, fêkî, şorbe, şîr û şerbetan Nar rakirîbû ser pêyan. Lê dîsa jî malxiraba nexweşîyê ji pîst û derîyê Narê nediçû. Xîzexîza singê wê, pişti Marîa Xanimê, icar dilê Gula Îsmê jî diqetand. Roj hêdî hêdî dadiket xwarê. Gulê serê Narê şuştibû. Dema ku bi pêşgîrê ew ziha dikir, wek tixtoreki guhê xwe jî dida ser sîngê Narê. Dîsa ew dengên xerab û xopan dibihistin. Ji nişka ve radibû ser xwe û bangî keçika xwe dikir:

”Xecêêê! Keçê zû were kincên Narê lêbike. Ez diherim hevşo hinda bavê te.”

Gula Îsmê wek ciwanekê, him berbi hevşo dibezîya û him jî bangî mêrê xwe Heydo dikir.

"Heydooo! Lo Heydo!”

"Çi bû Gulê? Bila xebera xêrê be!"

“Heydo, ev keçika nexweş e. Em bibin tixtor.”

"Çima, çi bû?"

“Wele rewşa wê, qet baş xuya nake.”

"Tu rast dibêjî, Gulê, em dê sibê zû rabin û bibin. Bila Nurî saxtîya wê bike, ka ew keçika ji bo çi baş nabe."

“Na na, sibehê nabe! Em ê niha, vê gavê bibin.”

"Niha? Devê êvarê ye, Gulê!"

“Bila bibe. Em ê bibin mêvanê Nûrî.”

"Ê baş e, de hûn hazirîya xwe bikin, ez jî hespan amede bikim."

Rojê êdî xatir dixwast. Û wek sinîyek sor dadiket xwarê. Şewqa wê sinîyê li ser Behra Wan ê wek lihêfek rengîn xuya dikir. Û mirov dikir nav xiyalên pir kûr û bêbinî. Dîmenên li der û dorên rê û bihna genîyê, siftê mirûzê mirovan tirş dikir û paşê jî wek hundir dianî ber verşandinê. Û ji ber wê sedemê, mirov ji mirovatîya xwe fedî dikir.

Ne pir dûr! Hîna berî mehekê, ji van rê û kolanan, deng û bihnên pir xweş û balkêş dihatin.

Nar, di himbêza Gulê da diçûbû tixtor.,

Û Xalê Heydo jî, hesp qamçîdikirin. Gula Îsmê, wek dayikek rastî, devê

www.arsivakurdi.org

Narê danîbû ser pêsîrên xwe, gep û porê wê diniwaxtin. Qet nedixwast, NAR wan bûyerên li der û doran bibîne. Ji ber ku, NAR'Ê ew tax û kolanan hemî nasdikirin. Erê, NAR li wan bexçe û kolanan mezin bibû. Û li van deran, belkê sed carî ketîbû pê pinpinîkên rengîn û cuda cuda. Paşê jî, bi banga Marîa û Garo, ji nûve vedigerîya û xwe diavêt himbêza wan.

Mal a min ê.!

Narê carinan hewl dida û stûyê xwe dirêj dikir. Dixwast li der û dorên xwe jî binêre. Lê Gulê qet fersend nedida wê. Û ew jî bi neçarî, ji nû ve vedigeriya ser pêsîrên Gulê.

Hêzên Hemîdî, di navbera gund û bajaran da, rê qontrol dikirin. Ji ber wê yekê, Xalê Heydo jî du caran hatibû rawestandin. Wî herdu caran jî yeksan bersiv dabû wan û wiha gotibû:

"Nevîya min pir nexweş e. Em diherin mala tixtor Nûrî." Û piştra jî, di ber xwe da, ji bo wan dest bi çêrên pîs kiribû.

Û piştî seetekê gihaştîbûn mala tixtor. Tixtor Nûrî, ji hêlekê ve Nar tazî dikir, ji hêla din ve, him ji bo parastina Narê, sipasîya nasên xwe dikir û him jî lom ji Gulê dikirin û wiha digot:"Mala bavê te ava nebe, Gulê. Te ji bo çi evqas kinc û cilk li vê keçikê pêçandîye? Tu nabînî ew di nav germî û şewatê da maye."

Tixtor Nûrî saxtîya Narê bi dawî anî û bi Gulê ra ev gotin dikir: "Gulê!... Kincên vê keçikê biguhere, em bibin nexweşxanê. Derdî vê keçikê ne nexweşîyek hêsan e. Li gora saxtî û têgihaştina min, dilê wê jî baş kar nake."

Piştî ravekirina tixtor, Gul û Heydo şaş û metel maûn. Dest û laşê Gulê di heman demê da tevhev dicirifîyan. Û xwe bi xwe ev dueya dikir: "Rebîyo! Xudanê erd û ezman. Tu arîkarîya vê sêwîyê bike û rûyê min nine xwarê."

Tixtor Nar ji destên Gulê girt û bir himbêza xwe û got: "Hûn piçek westî xuya dikin, ez dikarim arîkarîya wê bikim. Kerem bikin!"

Û îcar Nar di himbêza tixtor Nûrî da, diçû nexweşxanê. Gul û Heydo bi awayeki bêdeng û bênefes, li odeya tixtor Ferat rûdiniştin. Herdu jî di nav meraqek mezin da, li benda xeberek xêrê bûn. Bêdengîya odê, Gula Îsmê dikir nav tirs û telaşek qet nêyî zanîn. Gul carinan diçû saxtîxaneya tixtoran û di navbera derî da temaşeyî Narê dikir. Disa hewl da, lê îcar dengê tixtoran bihîst û ji nû ve li şuna xwe runişt.

Herdu tixtor, bi hev ra ketibûn hundir. Tixtor Ferat, li kursîka xwe rûnişt û bi awayeki xemgîn wiha digot:

www.arsivakurdi.org

”Kek Heydo! Em dixwazin Nar du an sê rojan, li vira bimîne. Rewşa keçikê, cidî û girîng e. Lê vê baş bizanibin ku tu lomê we tuneye. Carinan hinek zarok, ji dayikên xwe nesax tên dinê. Em dikarin bêjin, Nar jî ji wan yek e. Vê gavê li gora biryara min û kek Nûrî, di dilê Narê da qulek biçûk heye.”

Û Gula Îsmê dest bi girî kiribû. Tixtor Ferat rabû ser xwe û hat li hêla Gulê runişt û ev gotin kiribû:

“Gulê, xwişka min! Nexweşîya Narê girîng e. Lê vê gavê tu tişteki ku em jê bitirsin û yan jî bi xeter tuneye. Bawer bike tuneye. Ez hema hema bîst zarok û kesên ku bi vê nexweşîyê dijîn nasdikim. Hemî jî sax û silamet in. Negirî xwişka min, negirî!”

Û tixtor Nûrî jî bi Gulê û Heydo ra ev gotin dikirin:

“Meraq nekin! Ji vira ha, Nar him nexweşa me û him jî keçika me ye. Em barî Narê tenê li ser milên we nahêlin. Em dê jî bibin arîkarî wê.”

Derîyê odê lêdiket. Hevşîreyek ciwan ketibû hundirê odê. Û ev agahîya dida tixtoran:

“Kek Ferat, li odeya sêyemin cihê Narê amede ye.”

Tixtor Ferat sipasî hevşîreyê kir û bi Gulê ra wiha got:

”Gulê, de rabe xwişkê! Tevî hevşîrê here û keçikê bi cih bikin. Tu jî li cem Narê bimîne. Bila kek Heydo jî bibe mêvanî me. Em dê di van sê rojan da tevî tixtorên din saxtîya keçikê hin baş biceribînin û li gora wê derzî û dermanan bidin. De hûn herin, em jî li pê we tên.”

Piştî wan sê rojan êdî derd û nexweşî ya Narê hatibû zanîn. Li gora nêrînên tixtoran ew nexweşîyek domdar û mayînde bû. Tixtor Nûrî, mêvanên xwe oxir dikir û ji bo Narê ev şîret dikirin:

”Bi lênihêrîn û parastinek baş, Nar dê barî vê nexweşîyê sivik bike înşallah. Ez û kek Ferat jî, em ê bibin arîkarî wê. Hûn meraq nekin!”

Û bi Narê ra bi zimanê wê demekê axivi û paşê jî mêvanên xwe bi rêva kir.

*

”Ez hema hema berî heftê salî hatibûm vê malê. Eşîra min û Heydo î rehmetî yek e, lê du par in. Alîyê Heydo bawerî bi Hezret Elî, em jî bawerî bi Hezret Mihemed dikin. Min Bekir, Xecik û Nar li gora bawerîya xwe mezin kiribû. Bi qasî min, Heydo jî ji Narê pir hez dikir. Heydo mêrekî bi xwe ewle û qêm bû. Qet şîn û gîrîn nedizanî. Lê dema ku ji tixtoran nexweşîya Narê bihist, hingê pişta xwe dabû dîwarê nexweşxanê û demekê

www.arsivakurdi.org

girîya bû. Wan salan, Heydo bi xwe jî nexweş bû. Disa jî hetanî mirîna xwe, li ser karê xwe bû. Lê nexweşîya Narê, wek Heydo jî bêmecal hiştibû.

Xwedê ji we, ji tixtor Nûrî û Ferat razî be.Her mehekê yek ji wan li hespê xwe siwar dibû û dihat saxtîya Narê dikirin. Ji derzî û dermanan bigirin, hemî kêmasî û hewceyên wê dianîn. Wek: kinc, meras, pirtûk, listok û tiştên xwarinê. Qet nedixwastin em peran xerc bikin. Ferat rehmetî, çendek sal berê, ji ber nexweşîya dil, çûbû dilovaniya Xwedê. Nûrî û jina xwe jî barkirin çûn Îstenbolê hinda zarokên xwe. Pirr arîkarîya Narê kiribûn pir.

Nara min, Nara min!...

Mala minê! Pênc an şeş salan guhên wê hertim li derîyê malê bû. Dema ku ji derve da kesek dikete hundir, an jî dengê kuxikekê dibihîst, hingê wek çûçikekê difirîya derve û wê derî vedikir.

Ez qurban, ez qurban!

Keçikek pirr zîrek bû. Ji Xecikê başstir bi kurdî diaxivi û baştir Quran dixwand. Tevî min limêja xwe dikir. Piştî limêjê, demek dirêj destên xwe vedikir û bi wî awayî due dikirin.

Min rojekê jê pirsîbû: Keçê tu ji bo çi ewqas dirêj dueyan diki, tu ji Xwedê pir tiştan dixwazî an ne? Wiha bersiv daû min:

'Na na, welle tu tiştan naxwazim. Ez ji bo dayik û bavê xwe yên berê, dapîra xwe û ji hevalên xwe ra due dikim. Lewma piçek dirêj diajo.'

Li daweta Xecikê hina biçûk bû. Lê li daweta Bekir sêzdeh salî bû û ketibû serê govendê."

Xaltî ya Gul, disa digirîya. Lê îcar Xaltî ranediwestîya. Serê xwe kiribû nav herdu mistên xwe û bi wî awayî digirîya. Dema mirov li rewşa xaltîyê dinêrî, hingê hîn baş têdigihaşt ku tukes naxwaze qala wan salên dijwar û bi xwîn bike. Me paşê ji cîranan bihîst ku Nar di wê govendê da ketîye erdê û paşê jî revandine û birine tixtor.

Li gora bawerîya ol û oldaran, Xwedê pêşeroja jîyana me, li enîya me giştikan yek bi yek nivîsandiye. Lê ya Narê, yan çewt hatibû nivîsandin, yan jî bi temamî hatibû ji bîr kirin. Narê ew nivîsa çewt bi tena serê xwe, dixwast rast û dirist bike. Lê çawa?

Û bi wî awayî, sal di pê salan dimeşîyan.

Ê berdewam bike ...

Mam Recall / U.S.A.
mamoste.kart@yahoo.com

www.arsivakurdi.org

Ji Mikaîla çend henekên bûyî ji vegotina Mehmedê Hecîbegê

Ev helbest û çîrokên li jêr, ji gundî Mikaîla (Inler köyü-POLATLI) Mehmedî Hecibegê bi destî xwe nivîsandine û ji bo weşandinê destûr dawû me. Wî bi qasî 20 meseleyan kin bi kin nîşan kiriwû. Qasî ku me kanî, me ew ji xwendewanên Bîrnebûnê ra amade kirin.

Û em dixwazin bi çend peyvan qala Mehmedî Hecîbegê jî bikin. Ji ber ku mala wana di tarîxa, navça Anatoliyê da roleka bi nav lîstîye.

Ji Mala wan ra, ji bera wan ra diwêjin: Mala Axê yan jî Mala Kosa. Navî Axê yî rastî Gafur oğlu Ali ye, li wê derê wek Alişer yan ji Haci Ali jî tê naskirinê. Axe di salên 1875an da heta salên 1893an girêdayi wîlayeta Enqerê axatîya heft gundên vê deverê kirîye û di wê dewrê da ji Qonyayê bigre, heta Qirşehirê ji kurdên kurmanc bigrê, heta kurdên şêxbizeynî, bi wan meritî û xisimtî çêkiriye. Merikî gelek zîrek û sîyasî bûye. Li dû wî, dîsa nevîyê wî Hesen (Hasan Kahraman) yanî Hecîbegê ew şan û şureta kalî xwe berdewam kiriye.

Mehmet Kahraman jî lawê Hecîbegê ye û ji boyî me taymendmendîya herî balkêş ew e ku wî hîn ji xortanîya xu da heta nika tim li kesayetîya xwe ya kurdî xadî derketîye, dile xu ji bo miletî xu lêketiye û ji boyî vê jî çi hatiye bîra wî û li dorberê wî, ew anîye ser xetê û nivîsandîye.

Wekî hûn jî dizanin di nav çîrok, henek û meselên wan derên me da tiştên li ser doxinê û cinsî pir in. Lê balkêşîya va hîkayan jî ji xwe ew e.

Ew kesên ku navê wan di meselan da derbas diwe, hema hema gîştik çûne rehmetê. Li paş helbesta birêz Mehmed, em ê ji wan henekan jî çendan ji we ra pêşkêş bikin. (Bîrnebûn)

BERÊ

Berê mahsul yari genim yari ce wû.
Ne eldînik ne sune hewû.
Bihar hat baran nebarî,
Dîsa newû dîsa newû.

Qizilbaşak me direşand,
Ne holder wû ne gubre wû.
Heya payîzê me genim dikşand
Ne deyn hewû ne icra wû.

Mehmet Kahraman
Mikaîla (Inler Köyü) – Polatli

www.arsivakurdi.org



Mehmedê Hecîbegê (Mehmet Kahraman) di hewşa mala xwe de.

1-Laz xoce Quranê rayê zarya didi!

Inandum iman keturdum!

Di sala 1960an da, gund ji xu ra mellekî laz digrê. Havînê mixtar ji xoce ra dibêje: *Xoca bu çocuklar boş geziyor. Bunlara camide kuran kursu verirsen iyi olur!* (Xoce zaro vala digerin, tu dikarî dersa Quranê bidi zarya?)

Xoce jî diwêje:

– Baş e! û dest pê dike.

Di dersa yekê da xoce dibeje:

– Çocuklar penum her dediğimi aynen tekrarlayun, pen ne dersem sizde onu deyin. (Zarokno, min got çî, hûn jî wek min, wê dubare bikin.) Xoce wekî me nivîsand, bi devoka behra reş deng dikir.

Ji wir Usê (Yusuf Karayel) radibe û jê ra diwêje: Penum tedugumu tekrarla da!

– Inandim iman keturdum! (Min bawer kir û hatim îmanê)

Us jî weki wî diwêje:

– Inandum, iman keturdum!

Xoce car din diwêje: Oğlum Yusuf oyle tezul! Inandum, iman keturdum diyecesun...

Us dîsa wekî wî diwêje, tamam hocam!

– Inandum, iman keturdum!

Laz Xoce pir bi hêrs dikive, îcar jî yekî din radike, lê ew jî dîsa wekî wî

diwêje.

Kê radike, ew wekî wî diwêje:

– Inandum, iman keturdum!

Xoce dest ji qursê berdide û bi hêrs derdikive derva.

Gundî wî dîwînin û jê dipirsin, ka wî çima qurs terikandîye.

Ew diwêje:

– Min ji zarya ra got ku ka min got çi hûn jî wekî min biwêjin, lê wana bi min qerfê xu kirin, bi min kenîyan!

Mixtar diwê:

– Ka te got çî?

Laz Xoce diwê min got:

– Inandum, iman keturdum, zarya jî got: Inandum, iman keturdum.

Îcar jî gundî gî bi hev ra dest pê dikin dikenin.

Xoceyê laz şaş û metal dimîne. Mixtar diwê:

– Xoca! Çocukların bir günahi yok sen demişsin beni aynen tekrarlayin. Onlarda öyle yapmışlar. Bunların çoğu zaten türkçe bilmez, ne bilsin senin laz ağzıyla konuştuğunu.

Laz xoca diwê:

– Haa oylemu da?

Lê li gund pir namîne û wextik şûnva ji gund tere!

2– Cingen ayağını kaldır İt sansınlar!

Hecali Rutonun şakacılığını köyde ve Polatlı, da herkes bilir.

Polatlıya zamanında çok sert bir kaymakam geliyor. Öyleki çarşıda, köylerde herkesin içinde insanları tekme tokat döven biri!

Bir gün Polatlıda Cingen Kiraz Adliyeden çıkarken çişi geliyor ve dayanamayarak hemen çıkış kapısının önünde çıkarıyor ve işemeye başlıyor.

Tam o esnada sert kaymakam dışarı çıkmasın mı!

Kaymakam onu bu halde görünce tekme tokat girişiyor ve polisi çağırarak onu içeri atmalarını söylüyor.

Bu esnada köylümüz Hecali de tesadüfen bir iş için adliyeden çıkıyormuş. Cingen Kirazı da iyi tanıdığı için ona yardım etme, onu bu zor durumdan kurtarma ihtiyacı hissediyor ve ona dönerek:

– Cingen ayağını kaldır it sansınlar! ayağını kaldır it sansınlar!

Bu lafı duyan sert kaymakam başlıyor kahkahalarla gülmeye.

Çağırıyor Hecaliyi ve ona kim olduğunu soruyor. Neticede Cingen Kiraz köylümüz Hecaliye Rutonun sayesinde bu işi bir kaç tekme ve küfürle atlatıyor. Kaymakam onu affediyor.

3– Hesê Qerehecî çûyî dergîstîyê

Ka gişka tevhev beqilîne bira Apo bixu!

Hese Qerehecî yan jî wekî li

www.arsivakurdi.org

gund herkes wî nas dike, Apora ji gundî Koçka keçikekê dixwazin. Berê wek edet bûye. Apo cara yekê tere dergîstîyê.

Lê kê gihiştandiyê em wê nizanin ji dergîstîya Hesê ra gotine: Hes tu bi hesawa nizane.

Hesê xelatîya xu hilgirtîye çûye Koçka û bi şev jî çûye mala dergîstîya xu li pencere xistîye.Wekî edet bûye, xebera xasiyê di siwêda lê heye ku ewê êvarê ware mala wana. Xasiyê derî jê ra vekirîye û ew hilgirtî zik malê. Hesê çiqiya xelatê daye xasiyê (Ihtimal têda şekir, fisteq, helaw û piskut û loqim hewû!)

Hes û dergîstîya xu va dikevin xanîkî û tenê dimînin.

Çiçikî wext derbas bû şûnva dergîst dixwazi hû bike ka Hes dikare bi hesawa yan na! û jê dipirse:

– Heso li mala me 10 hêk hene, ji wana 3 ketin, keştîyan, çend man?

Hesê hesab nedizanî lê merikî zîrek bû, biaqil bû. Ji heneka jî pir hez dikir. Çexî dergîsta xu diwe û jê ra diwêje:

– Tu ki çibike çend mane yan jî nemane ku ew hêk keştîyane û nekeştîyane, giştika tevhev ke, biqelîne bira Apo bixu, Apo birçî bûye!

Bi va gotina xu, xu ji vê îmtihanê dergistîyê xilas dike, him jî zikî xu yî birçî bi dergîsta xu dide têrkirin. Dergîst ji boyî ku eyb newe, radiwe ji wî ra çend hêkan diqelîne û tevhev dixwin.

Xadê rehma xu lê ke! Merikî pir dilpak wû.

4– Mesela Yîwîşî Şêxoyî Ûsî Bîlêl

Anami yedim, babami yedim, az kaldim sizimde yiyecektim!

Berê ku zaro **diçûn mektewê** piraniya wana **bi tirkî nedizanîn.** Di meha biharê **da, wexta pîvanga da** zaro tên mektewê. Mamoste dixwaze ji wan bipirse ka wana di dawiya heftê da **çi kirine, wexta xu çito derbas ki**rine û Yîwişî Şêxo radike ser texte û jê dipirse:

– Ibiş (Dûra nave xu kir Tuncer) sen hafta sonunda ne yaptın? **Ibiş haftaso**nu neler yaptın bize anlat bakalım!

Ibiş bi Tirkiya xu ya nîvî

– Öğretmenim biz çigdem toplamaka gitti, çok topladi.

O kadar **çok topladi ki, anami ye**dim, Şêxo mi yedim, Ezetimi yedim, Gidemi yedim, az kaldim sizimda yiyecektim!

Ögretmen diwê:

– Aman yavaş Ibiş bu ne oburluk önüne geleni yemişsin!

Zaro gi dikenin. Dûra ew fehm diki ku Ibiş dixwaze ji wî ra biwêje: Ögretmenim hafta sonu **çigdem to-**

www.arsivakurdi.org

plamaya gittik. Çok topladık. Annem, Şexo, Kardeşim Ezet ve Gide yediler. biraz daha da kaldı onuda size yemeniz için getirecegim.

Köyde o zamanlar kürtçenin ne kadar hakim olduğunu da anlatir bize bu hikaye.1950, li yıllardır.

5– Mesela Yehoyî Usî Mêlle û Yîwişî Osikê

Li gund wek hertim, mêr li ber dîwarekî rûniştîne ji vir û wê da qal dikin, henekan bi hev ra dikin. Berê mêre cemaatê pir wûn. Meriya guh didan ser hev, çûktî, mezintî hewû.

Yehoyî Ûsî Mêlle jî di wa wextana da hal wexta xu baş bûyî, dixwaze xu çîçikî bipesîne ku ka ew çito ji wana dewletîtir bûye.

Diwêje:

– Lo Yîwiş dunyaye işte, mezeke berê hûn dewletî bûn! Lê îro şukur ji xadê ra em ji we dewletîtir in.

Yîwişî Osikê bi sebr ji wî ra tim diwêje.

– Erê Yeho, heqe te heye Yeho, nika hûn ji me dewletîtir in Yeho!

Lê Yeho nasekine. Hîn jî dewam dike. Yîwîşî Osikê ji li gund bi henekcîtiya xu, bi camêrtîya xû û bi bersivdayîna xu bi navdar bûye.

Ew êdî waqas bîhnteng diwe ku nikare xu bigrê û diwêje:

– Yeho ka hûş be û îcar jî guh bide ser min! Dixwazim ji te ra tiştekî biwêjim. Rastî nika tu dewletî yî. Lê vê bîr meke! Xir! yekcaran dirêj diwin yekcaran jî kin! lê ew tim xir e! Lê gun ne dirêj diwe, ne jî kin, tim wek gun dimîne.

Yeho tevda sor diwe û dengî xu dibire. Cemaat gî bi va şora Yîwîşî Osikê di bin çava da dikenin.

6– Fatika Behrî ticaretê diki

Diwêjin li Mikaila cara yekê wek jin, Fatika Behrî pere bi faîz didayîye xelkê. Rokê dîsa ji gund yekî destê xu teng bûye, ji wê pere bi deyn xastî.

Faîza wengê jî ji sedi 30 bûyî. Mêrik jî gotiyî: Tu yê ji min ra çiçikî din daxînî, ew pir e! Ez nikarim bidim!

Fatik jî ji boyî ku xu bi heq derxîne û mêrik jî îkna bike, diwêje:

– Wîî! Qurba qurba! Qey ew heqê sêwiya ye, heqê yetima ye! Hewkî din di serkî! guneyî!

Diwê ku ev mubalaxa bî jî, lê ev li gund dihat qalkirinê.

Rehma Xadê le gîştika we!...

Zemani wana zemanekî rind û xaş wû!

Amadekar: Dr.Mîkaîlî

www.arsivakurdi.org

Pênc qehreman

Îrfan Baysal

Li ber kaniyê û li bin siya darê penc mêr runiştibûn. Bi hevdu ra sohbet dikirin jîpek tê li ber van disekine û çend kes jê peya dibin. Silafa xwe didinê û li ba wan rûdinin. Ew memurê dewletê bûn. Ji va pênc kesan ra dibên:

– Em navên gundan ji nû va didinê. Ji bo vê em dixwazinî navî gundê we jî biguharînin. Hûn dibên çi? Ma navî gundê we çi be?

Her pênc kes li çav havdu mêze dikin û tiştekî nabên. Dibe bi tirkî jî nedizanîn! Netigêhiştin ku memur dibên çi?! Çend deqe derbas dibin memur bersivekê dixwazin. Lê bersiv tune. Îcar bi hêrs navekî dixwazin, bi tirkî çi dibe ma bibe lê disa bersiv tune. Li dawî memurek ji memurê din ra, dibê:

– Binivisîne "beş eşek köyü" û li jîpa xwe suwar dibin û derin gundên din.

Wek hûn dizanin navên gundên me bi vî awayî hatin guhartin. Em werin gundê *Beşeşekê*. Gundî Bêş eşekê bi navî Beş eşek tesdîq bû. Demeke şûva nav kirin *Beşekli*. Hin ji wê şûva ji bû *Beşişik*.

Ji alîkî va haqarata dewletê ji alîkî va jî fediya gund e. Va hatiya serî her gundekî. Navên me ji me heynan û navekî din dane me. Ji fediyan ra navî wana bi vi zaravî biguharine. Em werinî ser navî xwe yî eslî. Her gundek li ber xwe bide bi hevdu re û biryarekê heynin û navî bav û kalên xwe heynin. Ma va ji me ra rûmetek be.

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurmancên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê him bi tevgirêdana kurmancên Anatoliya Navîn bizanin, him jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

www.arsivakurdi.org



Bi navê ***Kürt Bilgeden Kürt İşçiye Mektuplar*** bi amedekariya A. Kadir Konuk ji nameyên Abdullah Baran ku di navbera 2006 -2008an de ji Çemşid Bender (Mehdi Halici) re nivisine ji aliyê weşanxana Edebiyat ve Eleştiri, bi zimanê tirkî li Tirkîyê derketiye.

Addullah Baran li gundê Omera hatiye dunyayê û xwendina xwe ya seretayî(îlkokul) li gundê xwe xwendiye, piştre ji bo debara malbata xwe wek piraniya kurdên ji Anatoliyayê berê xwe daye welatên Eruopayê û li Norvecê bi cîh bûye. Li wir karê restorang û pizzeriyayê dike.

Kitêp bi pêşgotina Îsmaîl Beşikçi û A. Kadir Konuk hatiye weşandin. Îsmaîl Beşîkçî hem bi kurtî li ser kurdên Anatoliyê û bi berfirehî jî Dr. Çemîd Bender û ji xebatên wi yên ji salên 1990 û vir ve dide nasandin.

Herwiha ronakbirek, avukatekî naskirî, hunermed û niviskarek ku çawa bi însanekî sade û bêsewad re dikeve têkiliyeke nefbiçûk. Ev nimûneyeke hêjayî gotinê ye.

Kitêb ji 144 rûpelan pêk tê û bi zimanê tirkî ye. Li dawiya kitêbê weke albumeke biçûk, çend dîmenên bîranînan fotograf hene.

www.arsivakurdi.org

KONFERANS

Tarix, ziman, mîrasa çandî ya kurdên Anatolîya Navîn û globalizm

Orta Anadolu Kürtlerinin tarihi, dili, kültür mirasi ve küreselleşme

Tarix: 20/07/2010
Saet/saat: 13.00
Cih/yer: Salona belediya Încovê/*Yeniceoba belediye salonu*

Bername:

13.00 Vekirina konferansê/*Konferansın açılışı*
Îlyas Kara, *serokê belediya Încovê*

13.10 Gotara Komîta Însîyatîfê/*İnisiyatif Komitesi adına konuşma*
Mahmut Erdem, *sîyasetmedar*

13.20 Dîroka kurdên Anatolîyê û koçberî/*Anadolu Kürtlerinin Tarihi ve Göç*
Nuh Ateş, *pedegog û nivîskar*

14.00 Rewşa ziman û mîras/*Dil ve Kültür Mirası*
Ali Çiftçi, *pedegog*

15.00 Navber/Ara

16.00 Hêzên global ên civakî û aborî/*Küreselleşmenin sosyo-ekonomik dinamikleri*
Prof. Dr. Halil Sariaslan

16.50 Yekitîya Ewropayê (YE) û Tirkîye/*Avrupa Birliği ve Türkiye*
Dr. Nebi Kesen, *ekonomîst*

17.20 Pirs, bersiv û pêşnîyaz/*Soru, cevap ve öneriler*

17.30 Dawî/*Kapanış*



www.arsivakurdi.org

ZIMAN Û ZAROKÊN ME HEBÛN Û PÎROZÎYÊN ME NE!



MIZGÎNÎ JI BO ZAROKAN

Gelî zarokên qenc û şîrîn!
Mizgînîya me li we. Va ye APECê ji bo we bi kurdî: bi zaravayê zazakî, soranî û kurmancî ev kitêbên şîrîn weşandine. Her kitêbek CDya xwe jî heye. Ku hûn bixwazin, hûn dikanin di ber xwendina kitêbê re bi deng jî guhdarî bikin.



apec förlag

Navnîşana xwestinê li Swêdê
Box 8121
163 08 Spånga/Sweden
Telefon: 0046 (0)8 761 81 18
Fax: +46-8-761 24 90
E-mail: orderapec@telia.com

Navnîşana xwestinê li Almanyayê
Muzaffer Özgür
Postfach 900 348, D-51113 Köln
Telefon: 0049-172 298 24 51
Fax: 0049 (0)2203-30 16 30
E-mail: birnebun@hotmail.de